



المركز السوري للإعلام وحرية التعبير

Navenda Sûriyayî ya Ragihandinê û Azadiya Derbirinê
Syrian Center for Media and Freedom of Expression

Lêkolînek li ser Mafê Bidestxistina Zanyariyan û Parastina jêder li Sûriyê

Pûşper
2022

"Azadiya zanyariyan mafekî mirov yê sereke ye, û kevîrê qorzîkê ji bo hemû azadiyên ku Neteweyên Yekgirtî pê bang dike ye".¹

“Azadiya zanyariyan mafekî mirov yê sereke ye, û kevirê qorzîkê ji bo hemû
azadiyên ku Neteweyên Yekgirtî pê bang dike ye”¹.

Li gorî biryara (59-A), ku di civîna yekem ya Desteya Giştî ya Netewyên Yekgirtî di
14/12/1946an de hatiye standin

Serpereştiya Giştî: Mazin Derwîş. Damezrêner û rêvebirê Navenda Sûriyê ya

Ragihandin û Azadiya Derbirînê.

Berhevkirin: Yehya Şqêr, Rojnamevanekî Urdunî, Lêkolîner di yasadananên Islamî de.

Berhevkirin û şirovekirina rapirsînê: 'Urwa Xelîfe: Lêkolîner û Nivîsjarekî Sûrî ye.

Lêveger: Tîma Navenda Sûriyê ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê

Yara Bedir: Rêvebira Programa Ragihandin û Azadiyan ya Navendê.

Dr. Eymen Mun'im: Rêvebirê Nivîsgeha Yasayî ya Navendê.

¹ Dr. Nebîle Ebdulfetah Qîştî. Ragihandkar navbera maf û erkan de. Kolêja Elreşîd ya Fêrkirina têkel - Komara Misir ya Erebi
Çapa yekem - Rûpel 159

<https://books.google.com.tr/books?id=cmEMEAQAQBAJ>

Kurteyeke cîbicîkar 01

Pêşgotin 03

Werzê yekem: Standartên navdewletî ji bo azadiya derbirînê û azadiya rojnamegerî û ragihandinê û bidestxistina zanyariyan 05

Lêkolîngeha yekem: Standartên navdewletî ji bo azadiya derbirînê û azadiya rojnamegerî û ragihandinê 05

Lêkolîngeha duyem: Sînordarkirinên rewayî li ser azadiya nerîn û derbirînê 08

Lêkolîngeha sêyem: Pêşketina dîrokî ya yasayên bidestxistina zanyariyan 10

Lêkolîngeha çarem: Standartên Navdewletî yên bidestxistina zanyariyan 12

Werzê duyem: Rewşa bidestxistina zanyariyan li Sûriyê û parastina jêderên zanyariyan ... 15

Lêkolîngeha yekem: Bidestxistina zanyariyan di yasadananên Sûriyê de 16

Lêkolîngeha duyem: Parastina jêderên zanyariyan ji bo rojnamevan û ragihandkaran 21

Werzê sêyem: Encamên rapirsîna li ser mafê bidestxistina zanyariyan li Sûriyê 24

Werzê çarem: Rêspasde 32

Hevpêç: Jêder û çavkanî 42

Kurtkirina zarwazên lêkolînê	
FOI, RTI	Yasayên Bidestxistina Zanyariyan yan Yasayên Azadiya Zanyariyan Freedom of Information, Right to Information
RTK	Mafê Zanînê Right to Know
RTKD	Roja Cîhanî ya Mafê Zanînê (28 Îlûnê/Siptember ji her salê) Right to Know Day
NGOs	Non-Government Organization Rêxistinên Ne-Hikûmî
CSO	Civil Society Organization Rêxistinên Civaka Sîvîl



Kurteyeke cîbicîkar

Bejdariya kara ya hemwelatiyan girêdayî zanyariyan e, ji bo wê yekê mafê mirov di zanîn û dîtina zanyariyan de, yek ji giringtirîn bingeheên avakirina dîmoqratiyê ya her welatekî li cîhanê ye, herweha bidestxistina zanyariyan alaveke sereke ye di rûbirûbûna gendeliyê û eşkerekirina şaştîyên hikûmetan de ye, û bi wê yekê rojnamevan û rêxistinên Ne-Hikûmî bi şêweyekî alîkar berev çareserîya şaştîyan dikarin balê bikişînin li ser wan şaştîyan. Herweha geştiyên bo zanyariyan bûye mafekî sereke ji mafên mirovan ji bo bidestxistina mafine din, ew yek ji xwestekeke berê ya her kesekî ye ji bo bejdariyê di civakê de û standina biriyarîne hişmendane ji hejmarek şûngirinên din, herweha karakirina mafê bidestxistina zanyariyan merceke sereke ji bo geştiyên bo wekheviya seranser û dadweriya regezmendiyê ye (Gender).

Ji ber ku bidestxistina zanyariyan kevîrê bingeheên yê gerentiya azadiya derbirîn û nerînê, û azadiya rojnamegeriyê ye, karakirina mafê azadiya derbirînê û azadiya rojnamegeriyê bê mafê bidestxistina zanyariyan nabe. Di sî salên dawiyê de, li cîhanê şepêleke berfireh ya derxistina yasayên bidestxistina zanyariyan derkete holê. 100 welatan yasayên xwe yê derbarê bidestxistina zanyariyan derxistin. Û ta niha 134 welatan yasadananên ku gerentiya vî mafî dikin derxistine, dinav wan de heft welatên Erebi hene, ev in: (Urdun 2007, Tûnis 2011 û Yemen 2012, Sûdan 2015, Libnan 2017, Mexrib 2018 û herî dawiyê ji Kiwêt 2020). Serbarî du welatan ku gerentiya mafê geştiyên û bikaranîna zanyariyan di destûrên xwe de dan e, ew ji Misir û Cezaîr in, Cezaîr bi rêya serrastkirina destûrî ya sala 2016an, û Misir di serrastkirina destûrî ya sala 2019an.

Weke hêvî ku em ji weke van welatan bicî bin, armanca vê lêkolînê nasandina giringiya vê babetê û bihêzkirina bejdariya gelêrî di danûstandina giştî derbarê derxistina Sûriyê yasayeke bi vî awayî ye ji bo gerentiya bidestxistina zanyariyan ji bo hemwelatyan bi giştî û ji bo rojnamevan û ragihandkaran bi taybetî, û gerentiya parastina azadiya jêderên zanyariyên wan û dehifdan berev vê yekê.

Ji bo wê yekê, tîma Navenda Sûriyê ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê bi hevkarî li gel lêkolînerê serbixwe `Urwa Xelîfe rapirsînek ji bo dîtina nerînên rojnamevanên Sûrî derbarê herdu dozên azadiya geştiyên bo zanyariyan û parastina jêderên rojnamevanî encam da, ew yek ji bi armanca têgehiştineke berfirehtir ya çalencên girêdayî van herdu babetên pir girîng ji bo karê rojnamevanî û azadiya derbirînê li Sûriyê. Ev lêkolîn weke pêngaveke destpêkî ye weke şopandinekê li gel arasteya cîhanî derbarê yasakirina mafê bidestxistina zanyariyan, hevdemî giringiya encamdana civatên gengeşeyî yê berfireh li gel aliyên corbicor yê xwedî bandor di berhevkirina yasakirineke bi vî şêweyî de û li gel aliyên sûdmend ji vê yasayê bi armanca geştiyên bo yasayeke seranserî ya bidestxistina zanyariyan li Sûriyê.

Li gorî rapirsînê 32.7% ji bejdarbûyan dibînin ku geştiyên bo zanyariyên fermî yan zehmet e yan jî pir zehmet e, ev yek dide xuyakirin ku yek li ser sê ji kesên nerîna xwe di rapirsîne de dane rastî astengiyê di bidestxistina zanyariyên aliyên fermî de tînin, ne tenê zanyariyên girêdayî babetine ku desthilatên Dîfakto weke hestiyar dibînin mîna ewlekarî û siyasî, lê zanyariyên xizmetguzarî û geştiyên bo hin datayên giring yê girêdayî jiyana hemwelatiyan jî, mîna zanyarîne wird li ser berbelavbûna pêketinê bi vayrûsa Koronayê, herweha 50.49% ji bejdarbûyan dibîne ku karîna geştiyên bo zanyariyên fermî nîvenîv e, û 16.97% dibîne ku geştiyên bo zanyariyên fermî hesan e û pir hesan e.

Nîşaner ji 1 heta 5 tê wateya ku tu nikarî bigihêji ti zanyariyên fermî, û 5 tê wateya ku tu dikarî bigihêji hemî zanyariyan, nîrxandina te ji asta geştiyên te bo zanyariyan li navçeya te çi ye?	Rêje %	Dubare
1	5.66%	3
2	26.41%	14
3	50.94%	27
4	7.54%	4
5	9.43%	5
Kom	100%	53

Piraniya bejdarbûyên rapirsînê dane xuyakirin ku dema ew coreke destnîşankirî ji zanyariyên girêdayî jiyana hemwelatiyan û pêşeroja wan bikar tînin, metirsiyek li ser jiyana wan peyda dibe. Herweha du ji sê yê rojnamevanên bejdar di rapirsînê de gotine ku yasayên li navçeyên karê wan tîne bicîkirin, mafê parastina jêderên zanyariyên wan gerentî nakin, ew yek weke babeteke pir metirsîdar tê hejmartin, nexasim hebûna yasane ku armanca wan berovajiyê wê yekê ye ango ew rastî fişaran ji bo eşkerekirina wan jêderan tînin, carinan jî ew rastî sizayên weke dozên dadgehî û tedabîrên ewlekarî tînin.



Pêşgotin

Hejmarek navên corbîcor li mafê bîdestxistina zanyariyan têne kirin, yên herî navdar ev in: Azadiya zanyariyan "Freedom of information", yan jî Gehîştin bo zanyariyan "Access to information" yan Mafê zanînê "Right to know". Wateya van zarwazan yek babet e: "Mafê kesê ku di civakê de dijî heye ku zanyariyên pêwîst yên girêdayî wî yan yên dixwaze bizane ji rêveberî yan desthilata ku wê civakê hukum dike, bîdest bixîne".

Ji demên destpêkî ve, Neteweyên Yekgirtî dan bi azadiya zanyariyan weke mafekî sereke daye, sala 1946an di civîna xwe ya yekem de, Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekgirtî biryara 59 (1) çesipand, ku dibêje: "Azadiya gehîştinê bo zanyariyan mafekî mirovî yê sereke ye, û pîvana hemû azadiyên din e ku Neteweyên Yekgirtî ji bo wê kar dike". Herwiha Kongirê Giştî yê Yûnîsko ku li Parîsê 17ê Cotmeha 2015an hate lidarxistin, roja 28ê Îlûnê weke Roja Cîhanî ya Mafê Bîdestxistina zanyariyan çesipand, herwiha Desteya Giştî ya Neteweyên Yekgirtî ew roj weke rojê cîhanî bi navê Roja Cîhanî ya Mafê Zanîne 2021 ragihand; Giringtirin mafê girêdayî mafê bîdestxistina zanyariyan, mafê parastina van zanyariyan û eşkere-nekirina wan e, ji ber ku neçarkirina rojnamevanan li ser eşkerekirina jêderên zanyariyên xwe dibe asteng li pêş gehîştina zanyariyan ji jêderên wan bo rojnamevanan, ango mafê hemwelatîyan di zanîne de tê binpêkirin.

Di doza Godwin ya li dijî Şahnişna Yekgirtî de (1996), Dadgeha Ewropî ya Mafê Mirovan piştî azadiya Ne-axaftinê girt, ew yek jî mafê sereke yê rojnamevanan ji bo eşkere-nekirina nasnameya jêderên nihênî yên zanyariyan e, ku wiha got: "Parastina jêderên rojnamevanî merceke sereke ye ji azadiya rojnamegeriyê ... û bê vê parastinê, dibe ku alîkariya jêderan ji bo rojnamegeriyê di warê agehdarkirina hemwelatîyan derbarê pirsên girêdayî perjewendiya giştî, were dûrxistin".²

Li Sûriyê, yasaya Yekîtiya Rojnamevanan ya sala 1990, madeya (A) ya jimare Pêncî dibêje ku mafê rojnamevan di bîdestxistina zanyarî û amaran ji jêderên wan heye, û mafê wî yê belavkirinê jî heye. Û nabe rojnamevan were neçarkirin ku jêderên zanyariyên xwe eşkere bike, ew yek jî di sînorê yasayî de be. Madeya 105 ya Peyrûya Navxwe ya Yekîtiya Rojnamevanan wî mafî bi vî şêweyî dubare tîne ziman:

a. Mafê rojnamevan ji bo bîdestxistina nûçe û zanyarî û amaran ji jêderên wan û mafê belavkirina wan, heye, û nabe were neçarkirin ku jêderên zanyariyên xwe eşkere bike, dive ew yek jî di sînorê yasayê de be.

Lê ji aliyê dîrokî ve, bi drêjahiya kar li jêr rewşa yasaya awarte çil û heşt salan, weke rewşa piraniya welatên ku desthilata ewlekarî ya herî bilind e û idî'aya parastina ewlekariya niştîmanî li ser piştî rêzgirtina mafên mirovan û rûmeta hemwelatîyan, lê karkirin li gorî van yasayan tinebû û ne neçarî jî bû, ango pir kesên ku di warê ragihandinê de kar dikin van yasayan nas nakin. Wê yekê jî bawerî navbera hemwelatî û ragihandkaran li Sûriyê nehiştiye, herwiha bawerî bi karîna kesên di warê ragihandinê de kar dikin ku serbixweyiya xwe ya pîşeyî biparêzin, nehiştiye, nexasim li jîr desthilata hikûmeta Sûriyê.

Hevdemî destwerdana desthilata ewlekarî di desthilata zagonsaz de, Madeya (28) ya mesrûma yasadananê jimare Pêncî, ya taybet bi çap û pirtûkxaneyan ya sala 2001,

ku sala 2011an yasaya ragihandinê ya jimare 108 şûna wê girt, û dibêje:

c- Pirs ji rojnamevan derbarê jêderên zanyariyên wî yên rojnamevanî nayê kirin, ji bilî zanyariyên ku li jêdereke berpirisyar vegeerîne û desthilata wezîr heye ku karta wî ya rojnamevaniyê jê bikişîne heger ew rojnamevan wê jêdera berpirisyar eşkere neke.

Rewş di rastiye de wiha nebû, weke mînak, Navenda Sûriyê ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê di raporta xwe³ ya sala 2009an de derbarê rewşa ragihandinê li Sûriyê ya herdu salên 2008-2009 gotibû ku Wîzareta Ragihandinê bê eşkerekirina sedemên pêwîst lîstên rojname û alavên ragihandinê yên ku ji aliyên hikûmî ve derdikevin, herwiha lîstên rojname û alavên ragihandinê yên taybet, nedan Navendê.

Lawaziya karkirinê bi madeya 7 ya Ysaya Ragihandinê jimare (108) ya sala 2011, ku di birgeya (b) de dibêje "Nabe ti aliyek daxwaz ji ragihandkar bike jêderên zanyariyên xwe eşkere bike, tenê bi rêya dadgehê di rûniştineke nihênî de dibe", rêneda ti ast ji astên baweriya jîdestdayî were vegeerandin, ne ji aliyê kesên di warê ragihandinê de kar dikin û ne jî ji aliyê hemwelatîyan ve.

41.50% ji rojnamevanên bejdarî rapirsînê dibînin ku arezûya xelkê derbarê axaftina eşkere ji rojnamegeriyê re, sîvil yan berpirsên di desthilata xwecihî de bin yên sekterên coracor li navçeyên karê wan, lawaz e, 49.05 ji rojnamevanên bejdar dibîjin ku ew arezû nîvenîv e.

Ev bersiv rastiya nebûna ti parastina jêderên zanyariyan didin xuyakirin, ew yek tê wateya tîrsa hemwelatîyan û karmendên fermî derbarê veguhestina her corê zanyariyan be jî, tevî ku nehestiyar jî bin, ji ber tîrsê ji şopandina ewlekarî û ya yasayî jî, ew yek jî dê bandorê li ser asta karê rojnamevanan û karîna wan ji bo belavkirina data û zanyarî û çîrokên rasteqîne yên girêdayî jiyan û pêşeroja hemwelatîyan bike. 98.10% ji rojnamevanên bejdar dibînin ku jêderên wan metirsiyên xwe yên ewlekarî carinan yan jî piraniya caran dema ew zanyarî ji wan têne veguhestin didin xuyakirin, ew yek jî rastiya asta tîrsa axaftinê ji rojnamegeriyê re li cem xelkê Sûriyê nîşan dide.

Asta arezûya xelkê ji bo axaftina eşkere ji rojnamegeriyê re li navçeya te çi ye (Sîvil yan berpirsên di desthilata xwecihî di sekterên coracor de)?	Rêje%	Dubare
Lawaz	41.50%	22
Nîvenîv	49.05%	26
Bilind	9.43%	5
Kom	100%	53

Jêderên te yên rojnamevanî ti metirsiyên ewlekarî dema zanyariyan didin rojnamevanan, didin xuyakirin?	Rêje%	Dubare
Qet ti metrisiyan nadin xuyakirin	1.88%	1
Carinan	54.71%	29
Pir	43.39%	23
Kom	100%	53

² <https://hudoc.echr.coe.int/fre#%7B%22itemid%22%3A%22001-57974%22%7D>

³ <https://scm.bz/studies/الرقابة-وضجيج-الرقابة-2008-2009-سوريا>

Werzê yekem: Standartên navdewletî ji bo azadiya derbirînê û azadiya rojnamegerî û ragihandinê

Bidestxistina zanyariyan merceke pêşî ji bo gerentiya azadiya nerîn û derbirînê, û azadiya rojnamegerî û ragihandinê ye, bê zanyariyên wird û bawerpêkirî dê azadiya nerîn û derbirînê û azadiya rojnamegerî û ragihandinê tenê nerîn û dîtînine ne li gorî rasteqîneyan bin. Herwiha gehiştin bo zanyariyan xwestekeke pêşdem e ji bo her kesî ji bo bejdariyê di jiyana giştî di civakê de, û ji bo standina biriyarine hişmendane navbera gelek şûngiran de di warên mîna hîlbijatin û bejdarî di karûbarên giştî yên dewletê û gengeşekirina siyasî û pirojeyên yasayan, û çavdêriya hikûmetan, û eşkerekirina bînpêkirinên mafên mirovan, û eşkerekirina gendelî û sistiya alavên hikûmetê, û hesankirina encamdana piojeyên bazirganî û aborî. Zanyarî yek ji baştirîn navbêncar e ji bo danûstandina navbera hemwelatîyan ji bo gehiştin bo bilindtirîn lihevkerî derbarê dozên coracor yên siyasî û aborî û civakî, lê girêdana bidestxistina zanyariyan bi zelalkarî û lêpîrsîn û rûbirûbûna gendeliyê ve, dibe ku bibe faktereke rêgir di bicîkirina vê zagonê de li cem aliyên cîbicîkar û aliyên ku gumana gendelî û sûdmendkariyê li ser wan heye, ango dibe ku jêngeha kar di nizimtirîn asta çavdêriya perlemanî û ragihandin û yasayî de be.

Lêkolîngeha yekem: Standartên navdewletî ji bo azadiya derbirînê û azadiya rojnamegerî û ragihandinê

Azadiya derbirînê yek ji giringtirîn mafan e di Belgenameya Navdewletî ya Mafên Mirovan de, û bîngeha yasayî wê yekê eşkere dike neku ava dike. Û yek ji giringtirîn azadiyên berevaniyê ye Defensive liberties ku bi xwe ji bo parastina kesên di rûbirûbûna desthilatên dewletê de hatiye danîn.

Derxistina Ragihannameya Cîhanî ya Mafên Mirovan UDHR sala 1948an bû xala destpêkirinê ji bo bandorê li ser pêşxistina yasadananên mafên mirovan li ser asta cîhanî û niştîmanî û herêmî. Ragihannameya Cîhanî ya Mafên Mirovan tekezî li ser "Mafê her kesekî di wergirtina nûçe û bîrokeyan de, heye", Madeya (11) an ya Ragihannameya Mafê Mirovan û hemwelatîyê Fransî ya sala 1789an dibêje: Azadiya bikaranîna bîroke û nerînan gerentî kiriye, û yek ji giringtirîn mafên mirovan e, her hemwelatîyek xwedî mafê axaftin û nivîsînê ye, û ji mafê wî ye tiştê ku bixwaze belav bike, lê ew ê berpirisiyar be heger ew azadî bi zîyan bikar anîbe, berpirisyaretiyeke ku yasa dê destnîşan bike. Ev nivîs yek ji nivîsên pêşîn bû ku ew maf destnîşan kir. piştî⁴ destûra Yûnisko ya sala 1945an⁵ weke yek ji belgenameyên navdewletî yên pêşîn di vî warî de bû.

Piştî wê yekê, madeya 19an ji Ragihannameya Cîhanî ya Mafên Mirovan destnîşan kir ku: "Her kesek xwedî mafê azadiya nerîn û derbirînê ye, ev maf jî mafê azadiya hilgirtina nerînan bê destwerdan, û dîtina nûçe û bîrokeyan û wergirtina wan, û belavkirina wan bi her alavekî be, bê berçavbirina sînorên giyografî, li xwe digre"

⁴ <http://unesdoc.unesco.org/images/0011/001176/117626e.pdf>
⁵ <http://unesdoc.unesco.org/images/0011/001176/117626e.pdf>

Li jêr berawirdkirinek navbera madeya 19 ya Ragihannameya Cîhanî ya Mafên Mirovan û Peymana Navdewletî ya mafên Sivîl û Siyasî û madeya 32 ya Belgenameya Erebi ya Mafên Mirovan⁶:

Belgenameya Erebi ya Mafên Mirovan 2004-2007	Peymana Navdewletî ya mafên Sivîl û Siyasî 1966-1976	Ragihannameya Cîhanî ya Mafên Mirovan 1948
Ji madeya 32: Ev belgenome mafê ragihandin û azadiya nerîn û derbirînê herwiha mafê derxistina nûçe û bîrokeyan û wergirtin û veguhestina wan bo kesên din bi her alavekî be, bê berçavbirina sînorên giyografî, gerentî dike. Ev maf û azadî di çarçoveya prensîpên bîngehî yên civakê de têne bikaranîn, û rastî ti sînordarkirin ji bilî yê ji bo rêzgirtina mafên kesên din yan navbangiya wan yan parastina ewlekariya niştîmanî yan sistema giştî yan tenduristiya giştî yan rewîştên giştî, nayên.	Madeya 19: 1- Her kesek xwedî mafê hilgirtina nerînan bê astengî ye. 2- Her mirovek xwedî mafê azadiya derbirînê ye. Ev maf jî azadiya wî di dîtina zanyarî û bîrokeyên corbicor û wergirtin û veguhestina wan bo kesên din bê berçavbirina sînoran, çî nivîskî yan çapkirî yan bi şûwazekî hunerî yan bi her awayekî ku ew hîlbijêre be, li xwe digre. 3- Li gel bikaranîna mafên ku di birgeya 2 ya vê madeyê de hatine, erk û berpirisyaretîne taybet hene. Li gorî vê yekê dibe ku hin sînordarkirin ji bo wê were danîn, bi mercê ku di nivîseke yasayî de destnîşankirî be û giring be: a) Ji bo rêzgirtina mafên kesên din yan navbangiya wan. b) Ji bo parastina ewlekariya niştîmanî yan sistema giştî yan tenduristiya giştî yan rewîştên giştî.	Madeya 19: "Her kesek xwedî mafê azadiya nerîn û derbirînê ye, ev maf jî mafê azadiya hilgirtina nerînan bê destwerdan, û dîtina nûçe û bîrokeyan û wergirtina wan, û belavkirina wan bi her alavekî be, bê berçavbirina sînorên giyografî".

Di vê berawirdkirinê de ev her sê peyv (Pêzanîn û wergirtin û veguhestina zanyariyan) di hemû belgenameyên girêdayî azadiya nerîn û derbirînê de têne dubarekirin. Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî ICCPR peymannameyeke navdewletî pabendpêkirî ye International binding treaty, ango ev peyman li ser yasayên niştîmanî yên xwecihî re ye, û divêtiya bicîkirinê di dema her berovajiyek hebe de ye.

⁶ <https://arij.net/wp-content/uploads/2019/02/حق-الحصول-على-المعلومة.pdf>

167 welat bûne aliyek di vê Peymanê de, ji wan jî Sûriyê ku di demên destpêkî de tevî Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî bû ango di 12/01/1969an de li gorî mersûma yasadanane jîmare 3⁷ ku ji aliyê Nûredîn Atasî ve hat derxistin, ku bû weke yasadaneke navxwe û divê were bicîkirin. Ji bo wê yekê Hikûmeta Sûriyê raporta xwe ya niştîmanî di civîna asayî ya seranserî ya Encûmena Mafên Mirovan sala 2016an pêşkêş kir.

Îlûna sala 2011an, Komîteya Mafên Mirovan ya Neteweyên Yekgirtî komênta giştî General Comment ya jimare 34 li xwe girt, ew dirêjtirîn komênt bû ku madeya 19 ya "Peymana Navdewletî ya teaybet bi Mafên Sivil û Siyasî" şirove dike, di komêntê de hatiye: "Azadiya Nerînê û azadiya derbirînê, mafê dîtina zanyariyên ku li cem destyên giştî ne, li xwe digre", ji bo bicîkirina vî mafî, divê welatên endam bi şêweyekî pêşdem zanyariyan bi şêweyekî asan û rastewxî û kara û praktîk danin ber destê hemwelatîyan. Herwiha divê ew welat rênimayên pêwîst ta ku hemwelatî bikarin zanyariyan bidest bixin, derxînin, mîna derxistina yasadaneke ku azadiya bidestxistina zanyariyan gerentî bike.

Standartên navdewletî rê didin sîordarkirina azadiya derbirînê ji bo parastina ewlekariya niştîman ya dewletê, lê ev standart neçar dikin ku Pişkinîna Sêalî di dema sîordarkirinê de were encamdan, angî divê sîordarkirin di nivîseke yasayî de destnîşankirî û pêwîstî be ji bo parastina berjewendiyeke pêwîstî guhdanê ji bo civakê. Ev sîordarkirin di dirêjahiya salên karkirin bi yasaya Awarte li Sûriyê (1698-2011) û piştî sîordarkirina di Ysaya Rgihandinê jîmare (108) ya sala 2011an de hatiye, tune bû, angî koka mafê bidestxistina zanyariyan ji ber qedexekirina belavkirinê ya berfireh ji aliyê ragihandkarî ve, jînav dibe, angî li gorî hejmarek zarwazên xwedî pirşirove mîna "Balavkirina her babeteke nêzî simbolên dewletê be ji aliyê ragihandkar ve qedexe ye"! bê destnîşankirina van simbolan, û wateya nêzîkbûnê!

Tevî ku pîrensîpên Johansborgê, ku belgenamayeke navdewletî ye, baştirin rênimayan ji bo bicîkirina hevsengiyê navbera azadiya derbirînê û parastina ewlekariya niştîman, pêşkêş dike, li gorî van pîrensîpên Johansborgê⁸, heta ku sînordarkirin rewayî be û di berjewendiya ewlekariya neteweyî be divê: Armanca wê ya rasteqîne parastina dewletê yan yekîtiya xaka wê li dijî bikaranîna hêz yan gefê, yan karîna dewletê ji bo bersivdana vê gefê bi bikaranîna hêzê, eger ji jêdereke derve, weke gefeke leşkerî, yan ji jêdereke navxwe, weke handana berev tundutûjîyê ji bo kodataya sîstema desthilatdariyê, be...bi taybet sînordarkirina li gorî binge hine ewlekariya neteweyî rewayî nabe heger armanca wê ya sereke parastina berjewendîne ku ti peywendiya wan bi ewlekariya neteweyî nebe, weke mînak parastina hikûmetê ji şermezarî yan eşkerekirina şaştiyan. Weke mînak, di bûyera belavkirina bi dizî ya lêkolîneke Wîzareta Berevaniyê ya Emerîkayê li ser şerê Vîtnamê sala 1971ê⁹, rojnameya Niyoyork Tayms xelekên pêşin yên lêkolînê belav kirin, piştî Wîzareta Dadê daxwaz ji rojnameyê bi rêya daxwaznameyeke dadgehê kir ku berdewamkirina belavkirina xelean rawestîne ji ber ku ew dê zîyanê bigihîne ewlekariya neteweyî ya Wîlayetên Yekgirtî, rojnameyê berdewamkirina belavkirinê rawestand, lê berê xwe da dadgehê û piştî xwe bi serastkirina yekem ve girêda ku azadiya belavkirinê dide rojnamegeriyê û çavdêriya pêşdem li ser qedexê dike. Di 30ê Îlûnê ya heman sale de, rojname di biryara dadgehê de serket.

⁷ <https://syrmh.com/2021/03/11/ال-العهد-الدولي-ال-مرسوم-انضمام-سورية-الى-العهد-الدولي-ال->

⁸ [https://hudoc.echr.coe.int/fre#{%22itemid%22:\[%22001-57974%22\]}](https://hudoc.echr.coe.int/fre#{%22itemid%22:[%22001-57974%22]})

⁹ <https://www.shorouknews.com/columns/view.aspx?cdate=28022018&id=8e12bba1-3d59-424a-a1d1-0b7615770ad5>

Lêkolîngeha duyem: Sînordarkirinên azadiya derbirînê

Azadiya derbirînê ne besînor e, dibe ku hin sîordarkirin li gorî standartên navdewletî li ser werin bicîkirin. Çalencêk girêdayî peydakirina hevsengiyê navbera azadiya derbirînê û parastina berjewendiyên giştî de heye (Bi taybet ewlekariya neteweyî, û reweştên giştî), serbarî berjewendiyên taybet ku dibe ku dema bikaranîna nebaş ya vê azadiyê, rastî gefê werin.

Sîndarkirininên azadiya derbirînê du beş in:

- Hilbijêrî optional di madeya 19 ya Peymannameya Navdewletî ya Mafên Sivîl û yên Siyasî de.
- Neçarî obligatory di madeya 20 ya Peymanname û Rêkeftina Qedexekirin û Sizadana Tawana Cenosaydê (1951), û Rêkeftina Tunekirina Hemû Şêwazên Nejadperestiyê.

Madeya 20 ya ICCPR: Bi yasayê her bangek bo kîna neteweyî yan nejadperstî ya olî ku dibe handanek bo cêwazî yan dujminkarî yan tundutûjiyê, qedexe ye. Lê "Prensîpên Tuşwanî" derbarê ewlekariya niştîmanî û mafê bidestxistina zanyariyê, şiroveyan derbarê geştişina hemwelatîyan bo zanyariyan bê peydakirina metirsiyê li ser berjewendiyên ewlekariya niştîmanî, pêşkêş dike, ev prensîp li gorî yasa û reftarên navdewletî û xwecihî rêbernamene wird û bêhempa derbarê sînardarkirina guncaw serbarî nihênîyê, destnîşan dike.¹⁰

Lê, li Sûriyê, rapirsîna ku di çarçoveya vê lêkolînê de hatiye encamdan, da xuyakirin ku piraniya bejdarbûyên vê rapirsînê dibînin ku di dema serederiyê li gel coreke destnîşankirî ya zanyariyan dikin, metirsiyek li ser jiyana wan peyda dibe, 92.44% gotine ku ew carinan yan herdem hest bi vê gefê dikin, hewiha 7.54 ji bejdarbûyan hestên xwe bi vê gefê red nekirine. Ev hestê bi metirsiyê yek ji rêgirên sereke ye li ber serederiya rojnamevanan li Sûriyê li gel hejmareke mezin ya babetên giring ku girêdayî jiyana û pêşeroja hemwelatiyan e, ji bo wê yekê rojnamevan gelek caran babetên bihtir ewle da ku li ser biaxivin, hildibijêrin, ew yek ji valahiyeke mezin di serederiyê li gel babetine giring ji bo sûriyan di rojnamegeriya wan de peyda dike, û dihêle gelek caran axaftina giring di rojnamegerîyê de tune be.

Tu weke rojnamevan, Dema serederiyê li gel coreke destnîşankirî ya zanyariyan dikî, Tu hest bi ti metisiyê li ser jiyana xwe dikî?	Rêje%	Dubare
Qet	7.54%	4
Carinan	47.16%	25
Berdewam	45.28%	24
Kom	100%	53

¹⁰ <https://www.justiceinitiative.org/publications/global-principles-national-security-and-freedom-information-tshwane-principles/ar>

Ji bo şirovekirina van metirsiyan, em dixwazin amaje bi yasaya ku ji aliyê Serokatiya Komara Sûriyê di a18ê Nîsana 2022n de bi jmare (20) derket, bikin, li gorî wê yasayê rêsayên sizayî yên tawana zanyariyê dê ji nû ve wrin birêkxistin, Ew yasa nimûneyek e ji bo girtina devê hemwelatî û rojnamevanan, ne tenê bi rêya alavên ragihandinê yên berê, lê bi rêya cîhana elektironî û soşiyal mîdiyaê jî, ango ew madeyên ku li gorî yasanivîsên di sîbera hikûmeta Sûriyê de kar dikin, htine nivîsandin, zarwazine ku nayên pîvandin tê de hene, armanca wan zarwazan vekirina dergehekî berfiretir ji bo sizadanê.

Madeya 27 - Tawanên girêdayî destûrê

Her kesê malperek yan rûpeleke elektironî saz kiriye yan birêve dibe yan naverokeke elektironî li ser tora internêta bi niyaza vejandina hin karan bi armanc yan banga guhertina destûrî bi rêne nerewayî, belav kiriye, yan veqetandina beşekê ji xaka Sûriyê ji serweriya dewletê, yan vejandina mangirtineke çekdarî li dijî desthilatên bedrest li gorî destûrê yan rê nede wan desthilatan erkên xwe yên ji destûrê wergirtine bicî bikin, yan kodata yan guhertina sîstema hukimdariyê li dewletê, dê rastî girtineke demkî ji heft heta 10 slan û bi sizayeke darayî ji (10,000,000) L.S deh milyon Lêreyên Sûriyê heta (15,000,000)L.S pazdeh milyon Lêreyên Sûriyê, were sizadan.

Madeta 28 - Têkdana şkomendiya dewletê

Her kesê bi rêya yek ji teknolojiyên zanyariyan nûçene nerast belav bike ku dibe ku şkomendiya dewletê têk bide yan nêzî yekîtiya niştîmanî bibe, dê rastî girtineke demkî ji sê heta pênc salan û bacekê ji (5,000,000) L.S pênc milyon Lêreyên Sûriyê ta (10,000,000) L.S deh Milyon Lêreyên Sûriyê, were sizadan.

Madeta 29 - Têkdana pêgeha dewletê ya darayî

Her kesê malperek yan rûpeleke elektironî saz kiriye yan birêve dibe yan naverokeke elektironî li ser tora internêta bi niyaza duristkirina daketin yan necêgîrî yan hejandina baweriyê di pereyên niştîmanî yan di nîrxê alogurkirina wê ya di alavên fermî de destnîşankirî ye de, belav kiriye, dê rastî girtineke demkî ji çar heta pênc salan û bacekê ji (5,000,000) L.S pênc milyon Lêreyên Sûriyê ta (10,000,000) L.S deh Milyon Lêreyên Sûriyê, were sizadan.

Em têbînî dikin ku di van madeyan de, ne-destnîşankirinek heye, ango çî wateya belavkirina naverokekê bi armanca vejandina hin karan ji bo banga?!! Gelo nûçeyên nerast di demê ku azadiya gehîştina zanyariyan ya rojnamevan û hemwelatîyan ji bo zanîna rastiyê ji nerastiyê, hatiye sînordarkirin, çî ne? Gelo weke mînak, axaftina hemwelatîyan li ser torên civakî li ser têkçûna rewşa aborî û ya jiyanê, weke hejandina baweriyê tê dîtin, û bibe ku bibe sedema girtina kesê ku belav kiriye?!!!

Lêkolîngeha sêyem: Pêşketina dîrokî ya yasayên bidestxistina zanyariyan

Mafê mirov di zanîn û dîtina zanyariyan de, yek ji giringtirîn bingeheên avakirina dîmoqratiyê ya her welatekê li cîhanê ye, bejdariya kara ya hemwelatîyan bi zanyariyan ve girêdayî ye, herwiha bidestxistina zanyariyan alaveke sereke ye di rûbirûbûna gendeliyê û eşkerekirina şaştîyên hikûmetan de ye, û bi wê yekê rojnamevan û rêxistinên Ne-Hikûmî û hemwelatî bi şêweyekî alîkar berev çareserîya şaştîyan dikarin balê bikişînin li ser wan şaştî û kêmasîyan. Rêxirina Madeya 19, ku bareqeha wê li Lundunê ye, dibêje ku zanyarî "Oksijîna dîmoqratiyê" ye, ango "Heta ku dîmoqratiya kara be, divê hemwelatî bikarin bigihêjin zanyariyan heta ku bikarin biryarine bi nîrx bistînin".

Arasteyeke mezin ya cîhanî berev danpêdana yasayî bi vî mafî heye, welatên cîhanê yên ku tiyê dîmoqratiyê ne, yasayên azadiya zanyariyan pesend kirine yan jî li ser wê yekê kar dikin. Siwêd (û Finlenda) sala 1966 yekemîn welat li cîhanê bû ku yasayek ji bo bidestxistina zanyariyan derxist¹¹, û piştî borîna 200 salî (ango sala 1966) bi tenê li çar welatên cîhanê hevşêweyê vê yasayê peyda bû, û heta sala 1990 ev yasa li hijdeh wekatan hebû. Di sî salên borî de, 100 welatan yasane bidestxistina zanyariyan derxistine, ev yek nîşana arasteyeke bilindbûnê ye ji bo pesendkirina van yasayan. 3ê Berfanbara 2021ê welatê "Ondurwa" dawîn welat bû ku ev yasa pesend kir, bi wê yekê hemû welatên Encumena Ewropayê (47 welat) xwedî vê yasayî dibin.

Êdî bidestxistina zanyariyan bûye mafekî destûrî ku di destûra derdora şêst welatên cîhanê de hatiye nivîsandin, ji wan destûrên çar welatên erebî, ew jî Mexrib sala 2011an, Misir sala 2014an, Tûnis sala 2014an, û Ceza'ir sala 2016an, tê têbînîkirin ku parastina destûrî ji vî mafî re di her çar destûrên borî de piştî bûyerên ku nav lê tê kirin Buhara Erebi hatiye. Hêjayî gotinê ye ku ev maf di destûra Sûriyê de tune ye û bi hêviya ku ev maf di pêşîn derefeteke bedrest de di wê destûrê de were nivîsanin.


Herwiha ya giring ew e ku bingehe di yasayên bidestxistina zanyariyan mafê hemwelatîyan be ne tenê mafê rojnamevana be, ango piraniya yasayên van welatan behsa mafê her mirovekî di bidestxistina zanyariya de dike, dinav de jî kesên biyanî.

¹¹ <https://studies.aljazeera.net/en/node/2065>


Werzê 27an ji destûra Mexribî wiha dibêje:

- Mafê hemwelatîyan di bidestxistina zanyariyan de heye, ew maf li cem rêveberîya giştî, û sazîyên hîlbijartî, û desteyên ku bi karên sektera giştî hatine erkkirin, heye.
- Nabe mafê zanyariyê ji bilî ku li gorî yasayê be, were sînordarkirin, bi armanca parastina her babeteke girêdayî berevaniya niştîmanî, û parastina ewlekariya dewletê ya navxwe û derve, û jiyana kesan be, herwiha parastin ji têkbirina azadiyan û mafên sereke yên di destûrê de hatine nivîsandin, û parastina jêderên zanyariyan û warên ku yasayê bi wîrdî destnîşan dike.

Dema di destûra Mexribî de, weke mînak, hariye ku "Nabe maf di zanyariyê de ji bilî ku li gorî yasayê be, were sîordarkirin", ev yek tê wateya ku nabe ev maf bi alaveke kêmtir yasayê were sîordarkirina (ji aliyê perlemanê ve tê pesendkirin) mîna sîstem yan rênima yan biryar. Û berovajiyê têgihiştina borî, weke mînak madeya (9/o) ji Yasaya Ragihandinê ya Sûriyê (ya bi mesrûma yasadananê jimare 108 sala 2011 hatiye desrxistin) wiha hatiye: Corên zanyariyên ku ji mafê aliyên giştî ye ku eşkere nekin, bi biryarekê ji Encumena Wezîran, tên destnîşankirin. Bi vî awayî em dibînin ku parastina destûrî ji bo mafê bidestxistina zanyariyan ji pileya parastina vî mafî ku tenê li gorî yasayê be, bilindtir e, ji ber ku serpêçiya yasayê ji nivîsa destûrî re, dê wê yasayê rastî çavdêriya destûrî û tanedanê li dadgehên destûrî, bike. Wate nebûna nivîseke destûrî ji bo vê parastinê derfeteke berfireh dide desthilata yasadane di sîordarkirina mafê bidestxistina zanyariyan.



National Right to Information Laws, Regulations and Initiatives 2021



Lêkolîngeha çarem: Standartên Navdewletî yên bidestxistina zanyariyan

Deh xalên hevbeş yên yasayên bidestxistina zanyariyan hene, ew deh xal weke standartên navdewletî yên herî diyar di vî warî de, tene dîtin. Ev prensîp hejmarek yasa û rêsayên herêmî û navdewletî li xwe digre, ku serederiya welatan, weke gelek babetên din yên di yasayên niştîmanî û rêsayên dadgehên niştîmanî hatine, pêş dixe. Serbarî prensîpên giştî yên yasayên ku girûpa Netewan danê pê dide. Ev yek bi xwe ji bo yasadana niştîmanî derbarê azadiya pêzanînê yan bidestxistina belgeyên fermî, hatiye sazîkirin, lê di heman demê de dikare li ser zanyariyên desteyên din mîna Neteweyên Yekgirtî û Yekîtiya Ewropayê û Banka Navdewletî, were bicîkirin. Hewiha ev prensîp, ji encama lêkolînine dirêj û şirove û rawêjkariyên madeya 19, ji pîsporiya berfireh û karê seranserî li gel rêxistinîne hevpar li hejmarek welatên cîhanê, pêk tê. Ev prensîp ji aliyê biryarderê Neteweyên Yekgirtî yê taybet bi azadiya nerîn û derbirînê di raporta sala 2000î de hatiye pesendkirin.

Ji aliyê xwe ve, Komîteya Taybet bi Mafên Mirovan, ya Neteweyên Yekgirtî, ku serpereştiya bicîkirina Peymannameya Navdewletî ya taybet bi Mafên Sivîl û yê Siyasî (ICCPR) dike, di komênta giştî jimare 34 de piştî du salan ji şewirmendî û gengeşeyê derbarê çawaniya şirovekirina azadiya nerîn û derbirînê ya ku madeya 19 ji peymannameyê gerentî dike, tekez kir ku "Madeya 19 ji peymannameyê mafê gehiştin bo zanyariyên desteyên hikûmî yên giştî, gerentî dike. Û divê welat kar bi hemû şîyanên xwe bikin ji bo gerentiya gehiştina bilez û asan û kara û praktîk ji bo zanyariyên kontrolokîrî ji aliyê dewletê ve yê di warên giştî de."

Ev prensîp ev in¹²:

- Prensîpa pihtirîn eşkerekirin Maximum disclosure,
- Rêklamkirin bo çanda Hikûmeta hişvekirî Open government, û erkê pêşdem yê belavkirinê Proactive duty to publish û erkê alîkariya daxwazkarên zanyariyan Duty to assist requestors
- Sîordarkirina istisnayên belavkirinê limited scope of exceptions
- Mafê herî bihtir pêwîstî bi guhdanê Overriding right
- Destnîşankirina dema pêwîst û guncaw ji bo bersivdana xwesteka zanyariyan Appropriate timelines for responding to requests
- Egera tanedana biryara redkirina bidestxistina zanyariyan Right to appeal the refusal application
- Hebûna desteyeke serbixwe ji bo gerentiya mafê bidestxistina zanyariyan Independent body to insure the right of access to information
- Destnîşankirina dema herî zêde ji bo parastina zanyariyan overall historical time limits
- Têçûya guncaw û dadwerane Fair cost
- Parastina kesên ku şaştîyên hikûmetê bi dizî belav dîkin Leaking and whistle-blowers protection

¹² https://en.unesco.org/sites/default/files/annex_iii_pub_8.pdf

Du rê ji bo eşkerekirina zanyariyan hene:

1-Eşkerekirina pêşdem ya zanyariyan yan karvedanê Proactive vs. Reactive approach

Li vir wizaret yan sazî piraniya zanyariyên giring ji bo xelkê belav dike bê wergirtina xwestekan.

Yek ji giringtirîn prensîpên yasayên bidestxistina zanyariyan prensîpa eşkerekirina herî zêde e Maximum disclosure ku tekeziyê li ser giringiya eşkerekirina zanyariyan di rewşine destnîşankirî de dike, divê desteyên giştî pabendiyê bi eşkerekirina zanyariyan bike, herwiha mafê her endamekî civakê ye bidest bixe, û her kesê xwe di hundirê sînore welat de dibîne dikare sûdê jê bibîne. Bicîkirina vî mafî ji aliyê kesan ve ti guhdaneke destnîşankirî bi zanyariyan pêwîst nake. Divê desteyên fermî yên ku rê li ber gehîştina zanyariyan li ber gel digrin, berpirsiyaretiya xwe di behanekirina redkirina xwe di her qunaxeke tetabîran de, hilbigirin.

Bi gotineke din, divê desteyên giştî zanyariyên ku belav nakin, di çarçoveya sîstema istisnayên di nivîsea yasayî de hatine destnîşankirin, eşkere bikin. Ji bo eşkerekirina zanyariyan, divê şiroveya "Desteyên giştî" hikûmeta xwecihî û desteyên hilbijartî û desteyên li gorî erkeki fermî kar dikin, li xwe bigire, serbarî kompaniyên kerta giştî, û desteyên niv hikûmî Gongos, û desteyên kerta taybet yên rêveberiya saziyeke giştî dikin û saziyên kerta taybet yên palpiştiyeke darayî hikûmî werdigirin yan xwedî hin zanyariyan in ku dibe ku eşkerekirina wan rê li ber gihandina zîyanê bi berjewendiya giitî bigire, mîna jîngeh û tendirustiyê.

2-Karvedan:

Li vir wizaret yan sazî piştî ku xwestekan ji xelkê werdigirin, pêşkêş dikin, ji bilî ku eger ew zanyarî di istisnayên ku nabê werin eşkerekirin de bin.

Tevî ku standartên navdewletî danê bi istisnayan didin, lê divê ew yêk li jêr têtê derbarê zîyan û berjewendiya giştî be. Divê desteyên giştî bersiva hemû xwestekên takekesî ji bo bidestxistina zanyariyan bidin, ji bilî ku eger deste bibîne ku ev zanyarî di çarçoveya hukma destnîşankirî ya istisnayan de bin. Ti bihane ji redkirina eşkerekirina zanyariyan tune ye, ji bilî ya ku desteya giştî bide xuyakirin ku ev zanyarî li gorî pişkinîna sêparçeyî ne Three part test ya ku di nivîsa madeya 19an ya Peymannameya Navdewletî ya taybet bi Mfê Sivîl û Mfê Siyasî de hatiye, ku wiha pêk tê:

- Di nivîseke yasayî de hatibe.
- Ji bo parastina armanca pirojeyê be.
- Sînordakirin li gel qebareya ziyana pêşbînîkirî guncaw be.

Gehîştin bo rewşeke hevsengiyê navbera mafê bidestxistina zanyariyan û parastina ewlekariya niştîmanî babeteke aloz e, bi taybet van rojan, ango bi taybet piştî tevliheviya navbera şerê terorê û giringiyên parastina ewlekariya netewyî de. Prensîpên Tuşwanî (Tshwane Principles) derbarê ewlekariya niştîmanî û mafê bidestxistina zanyariyan ji bo bicîkirina vê hevsengiyê û gerentiya gehîştina xelkê bo zanyariyan bê gehîştina zîyanê bo berjewendiyên ewlekariya niştîmanî, hatine saz kirin.

Berawirdkirin navbera yasayên bidestxistina zanyariyan li her şeş welatên ku yasane taybet berhev kirine, ew ji Urdun û Yemen û Tûnis û Sodan û Lubnan û Mexrib in.

	Urdun	Yemen	Tûnis	Sodan	Lubnan	Mexrib
Hebûna nivîseke destûrî	Na	Na	Werzê 32	Na	Na	Werzê 27
Erêkirina belavkirina pêşdem û otomatîkî	Hemwelatî	Hemwelatî û niştecih	Ji bo her kesî	Ji bo her kesî	Ji bo her kesî	Hemwelatî û niştecih
Mafekî hemwelatî û mirovî ye	Hemwelatî	Nivîskî	Nivîskî û elektironî	Nivîskî	Nivîskî	Nivîskî û elektironî
Mrcê hebûna sedem yan berjewendiyeke daxwazkarê zanyariyê	Erê	Na	Na	Na	Na	Ji bo armancine rewayî
Aliyekî serbixwe jib o wergirtina giliyan	Hemû endam karmend in	Rêpêderê zanyariyan	Coracor bi serokatiya dadwerekî	Li jêr serpereştiya wezîrî ye	Desteya rûbirûbûna gendeliyê	Desteke irehnûneratî
Biriyara aliyê wergirê giliyan neçarî ye	Ne neçarî ye	Ne neçarî ye	Neçarî ye	Ne neçarî ye	Neçarî ye	Ne neçarî ye
Istinane destnîşankirî û sînordakirî ku rê dide desthilateke texmînê ji bo rêveberiyê	Berfireh û texmînkirn		Destnîşankirî	Berfireh û texmînkirn	Rê dide desthilateke texmînê ji bo rêveberiyê	Berfireh û texmînkirn
Dema bersiva xwestekê	roj 30	15	roj 20	Heftiyek	roj 15	roj 20
Sizayên bersivnedana bi niyaz ya karmendî li ser xwesteka yasayî	tunene	Zîndankirin yan xeramedan	Xerame û sizayeke dîsplînkirinê	Zîndankirin	Tunene	Dîsplînkirin
Têcûyeke guncaw ji bo bidestxistina zanyariyê	Erê	Erê	Erê	Erê	Erê	Erê
Tanedana dadgehî bi biryara redkirinê	Dadgeha rêveberî	Dadgehên fermî	Dadgeheke rêveberî	Dadgeheke rêveberî	Dadgeheke rêveberî	Dadgeheke rêveberî
Aliyê serperştiyar li ser yasayê raportinan li ser karên xwe belav dike	Na	Erê	Erê	Erê	Erê	Erê
Rêzbendî dinava 123 welatan li gorî nişandera RTI-rating (Hejmara herî nizim baştir e) [1]	115	35	13	Tuneye	93	90

Parastina agahîderan Whistleblowers Protection Act

Hin welatan parastina agahîderan xistin nava yasaya bidestxistina zanyariyan (Weke Kîniya û Rewenda û yasaya bidestxistina zanyariyan li Lubnanê), lê hin welatên din ew yek xistin nava yasayên rûbirûbûna gendeliyê weke Urdun. Li welatine din yasayeke taybet ji bo parastina agahîderan hate danîn weke Wîlayetên Yekgirî yên Emerîkayê 1989, û Başûrê Usturaliyayê 1993, û herî dawî ji Hindistan 2011. Û li Sûriyê tişteki hevşeweyê vê yekê tune ye, xuyaye hîn dûr e.



Werzê duyem: Rewşa bidestxistina zanyariyan li Sûriyê û parastina jêderên zanyariyan

Encamên rapirsîna ku Navendê bi hevkarî li gel lêkolînrekî serbixwe pêk aniye, û ji bo vê lêkolînê, dane xuyakirin ku derbarê hebûna bilogine yasayî taybet bi ragihandinê ji aliyê rojnamevanên Sûriyê li navçeyên karên wan, nivê rojnamevanan tiştekê li ser wan bilogan nizanin, eger hebin. Zarwaza Bilogên Yasayî di vê pirisyarê de hatiye bikaranîn ji ber ku desthilatên dîfakto li Sûriyê bi hemû arasteyên xwe ve ne xwedî rewayetiya yasayî ne ji bo desxistina yasayan. Lê weke dîfakto wan yasa û rênimayên cîbicîkar derdixin ku gerek aliyên jiyanê birêk bixin, herwiha li gorî bersivên ku gehîştine me, nivê din yê nimûneya lêkolînê derbarê wan bilogan agehdar in.

Ti agahiyên te li ser bilogên yasayî yê taybet bi ragihandinê li navçeya te hene?	Rêje%	Dubare
Belê	49.05%	26
Nexêr	50.94%	27
Kom	100%	53

Serbarî vê yekê, 50.93% ji bejdarbûyan dibîtin ku gehîştin bo zanyariyên nihênî babeteke zehmet e yan pir zehmet e. û bi tenê 5.66% dibînin ku ev yek asan e.

Ev araste li cem rojnamevaên Sûriyê, zehmetiyeke mezin ji bo gehîştin bo zanyariyên fermî dide xuyakirin, ne tenê yên girêdayî babetine ku desthilatên dîfakto weke hestiyar dibîne mîna ewlekari û babetên siyasî, lê ev yek gehîşt asta zanyariyên xizmetguzarî û gehîştin bo datane giring derbarê pirsên girêdayî jiyana hemwelatîyan weke zanyarîne wird derbarê berbalvûna pêketinê bi Vayrûsa Koronaya nû jî, ew yek jî ji aliyê hin rojnamevanan ve yên ku civatên balkişandinê yên ku Navendê ji bo vê rapirsînê lîdar xistine, amaje pê kirine. Herwiha hin rojnamevanan dane xuyakirin ku hin babet hene ku negirêdayî babetên ewlekari yan siyasî ne jî li navçeyên wan weke hestiyar tene dîtin, rojnamevan nikare hewla gehîştinê bo zanyariyan bide bê ku ewlekariya xwe ya kesî neke metiriyê de mîna babeta bazirganiya petrolê navbera Rêveberiya Xweser û Desthilata Sûriyê ya li Şamê.

Heta çi astê li navçeya te rojnamevan bi asanî dikarin xwe bighînin zanyariyên fermî?	Rêje%	Dubare
Asan e	5.66%	3
Nîvenîv e	43.39%	23
Zehmet e	35.84%	19
Pir zehmet e	15.09%	8
Kom	100%	53

Herwiha, rapirsînê da xuyakirin ku piraniya rojnamevanan derbarê hebûna yasane kara li navçeyên karên wan ku rê li ber gehîştin bo zanyarîne destnîşankirî, digirin, agehdar in, ango eger rojnamevanek hewl bide li wan zanyariyan bigere, dê rastî lêpirsîna yasayî yan ya ewlekariyê were. Bi tenê 3 rojnamevanan di bersiva xwe de gotine ku hevşeweyê vê yasayê li navçeyên karên wan tunene, û 30.18% gotine ku ew qet nizanin ku hevşeweyê van yasayan hene.

Lêkolîngeha yekem: Mafê bidestxistina zanyariyan di yasadananên Hikûmeta Sûriyê de

Yasadanerê jîngeha yasayî ku rêxerê karê ragihandinê li navçeyên desthilata hikûmeta Sûriyê ye amaje bi mafê hemwelatîyan û mafê kesên di warê ragihandinê de kar dikin di bidestxistina zanyariyan de kiriye, ew yek jî di yasaya ragihandinê ya bi mersûma yasadananî de ya jimare 108 sala 2011, li gorî madeya 3, hatiye, ku karê ragihandinê li gorî van rêsayên sereke ye:

- 1- Azadiya derbirînê, û azadiyên sereke yên di destûra Komara Erebî ya Sûriyê, û Ragihannameya Navdewletî ya Mafên Mirovan, û Rêkeftinên Navdewletî yên peywendîdar yên ku Hikûmeta Komara Erebî ya Sûriyê ew pesend kirine de, gerentî kirî ne.
- 2- Mafê hemwelatî di bidestxistina zanyariyên girêdayî karûbarên giştî de.

Serbarî madeya 4an: Karê ragihandinê li ser binemaya bikaranîna alavên ragihandinê bi armanca danîna naverokên ragihandinê yên ku ne weke nameyên kesayetî tene hejmartin, ber destê xelkê yan danîna tenê beşekê li ber destê xelkê, hevdemî berçavbirina van pîrensîpên sereke:

- 1- Rêzgiritina azadiya derbirînê bi mercê ku ev azadî bi bîrewerî û perpirisyaretî were bikaranîn.
- 2- Mafê ragihandkar di bidestxistina zanyariyan û bikaranîna wan hevdemî berçavbirina hukmên ku di vê yasayê de hatine.

Madeya 9an ya vê yasayê, ev yek serbar kir:

a- Ji mafê ragihandkarî ye li her corê zanyariyan bigere û ji her aliyekî jî bidest bixe û ji mafê wî ye ku tişta ku bidest bixe, piştî ku bi hemû karînen xwe ji rastî û bawerpêkiriya jêdera wê pişt rast be, belav bike

b- Di çarçoveya karê xwe de, ji mafê ragihandkarî ye ku kongir û civat û civînen giştî yên vekirî amade bibe û naveroka wan belav bike.

d- Nabe ti alî sîordarkirinan bi mebesta peydakirina newekheviyê di derfeta bidestxistina zanyariyan navbera rojnamevanan de, feriz bike.

h- Divê alî û sazîyên girêdayî karûbarên giştî rê li ber asankirina erkê ragihandkar di derbasbûna wan alî û sazîyan û bidestxistina zanyariyan, xweş bikin.

u- Corên zanyariyên ku ji mafê aliyên giştî ye ku eşkere nekin, bi biryarekê ji Encumena Wezîran tî destnîşankirin.

Li gorî rênimayên¹³ cîbicîkar yên yasaya Ragihandinê ya bi merûma yasadana jimare 108 sala 2011 ji aliyê Serokatiya Encumena Wezîran di 04-02-2012, derketiye, madeya 4an dibêje ku:

Ji mafê ragihandkarî ye ku zanyariyan ji hemû alîyan bidest bixe, heta ku di karê xwe yê ragihandinê de bikar bîne, bi vî awayî:

a- Zanyarîne berdest û ne nihênî, nabe werin paşxistin, û weke skopîkeke ragihandinê ne: Divê yekser werin bidestxistin.

b- Zanyarîne pêwîstî amadekirinê: Pêwîstî pêşkêşkirina xwestekê li gorî madeya (10) ya vê yasayê ne.

Lê heman yasayê, di madeya xwe ya dehan de jî dibêje ku:

a- Bi berçavbirina hukmên birgeya (u) ya madeya 9 divê aiyên giştî bersiva xwesteka ku ji aliyê ragihandkarî ve derbarê bidestxistina zanyariyan hatiye pêşkêşkirin, piştî pêşkêşkirina belgeyeke ku nasnameya wî piştrast bike, ji roja ku xwestek hatiye pêşkêşkirin heta heft rojan, bidin, û eger di van heft rojan de bersiv nedan, ew xwestek weke redkirî tê dîtin.

b- Erkê Dadgeha Rêveberî ye ku li redkirina timamî yan ya beşekî ya xwesteka bidestxistina zanyariyan vegere, û divê di dema kêmtir ji mehekê ji roja pêşkêşkirina xwesteka redkirinê, biryareke dawî derbarê wê retkirinê bistîne.

Nivîsa borî tê wateya ku ya bingeş berdestkirina hemû zanyariyan ji bo ragihandkaran e, û berovajiyê wê yekê, li gorî dadgehê dimîne. Lê Encumena Wezîran birgeya (u) ya madeya 9, di giştandinekê de ku peywendiya navbera kesên di wîzaretan û hemû aliyên bi ser ve û ragihandinê de, birêk dixe, û aliyê berpirisyar di ber daxuyaniyê de, şirove dike, mîna giştandina serokê Encumena Wezîran Adil Sefer ku di gotara ku di rojnameya AlMerkez de bi jimare 1/12562 roja 7/9/2011 hatiye belavkirin¹⁴, ku di giştandinê de hatiye nabe kaesên di wezaretan û hemû aliyên bi ser ve de kar dikin, ti daxuyaniyên ragihandinî û rojnamevanî derbarê karê wezaretê û aliyên bi ser ve, ji bo ti aliyekê pêşkêş bikin, tenê wezîr yan kesekî ku ji aliyê wezîr ve rêpêdayî be dikarin wan daxuyaniyan bidin, ew yek jî li gorî biryarên civîna Encumena Wezîran ya 6/9/2011an, tevî ku di malpera Serokatiya Encumena Wezîran de ti lîst yan rênimane destnîşankirî sebarê belavkirina zanyariyan tunene, yekser Encumena Wezîran ji vê giştandinê piştî ku rastî rexneyê ji aliyê rohnameyên xwecihî yên fermî bi xwe jî hat, vegeriya.

Piştî kêmtir ji du mehan, serokê Encumena Wezîran ji wê giştandinê bi giştandina jimare 1/14851 roja 19/10/2011 vegeriya, ku dibêje: "Weke hevpêç ji giştandina me ya jimare 1/12562 roja 7/9/2011 re, em dixwazin zelal bikin ku mebesta me pêşkêşkirina daxuyaniyên girêdayî dozên aborî û bandorên wê di rewşên vê demê de ye, neku dozên girêdayî pîlan û karê wezareta we û aliyên bi ser ve ye, ji bo pêzanî û zelalkirinê ji bo aliyên peywendîdar).

Li vir tê xuyakirin ku aliyên ku xwestek ji wan re tîne pêşkêşkirin sebarê zelalkirina sedema retkirinê ne neçarkirî ne, ew yek jî bi awayekî mezin û bi nerênî bandorê li ser wate û koka piroseyê dike, Em dikarin bibêjin ku ev alî ji neçarkirina pêşkêşkirina zanyariyan, yan behanekirina xemsariya wan derbarê pêşkêşkirina van zanyariyan, dûr in, tevî ku madeyên yasayî yên xwedî çendîn şiroveyên vekirî, yên behsa qedexekiriyên belavkirinê, di yasadana Sûriyê de, dikin, pir in, ya herî xuyayî jî madeyên yasaya Sizayûn Sûriyê yên bi yasaya jimare 15 sala 2022 serastkirî ye ku hejmarek sîordarkirinê arezûmendane li ser azadiya ragihandinê datîne, ew yasa tawanên "Têkbirina şikomendiya dewletê û gihandina ziyane bo nansaneya niştîmanî yan ya neteweyî", li xwe digirin. (Madeya 287), "Belavkirina nûçene nerast" (Madeya 285) ku dibe ku bêzariyê yan lawaziyê dinava civakê de belav bike (Madeya 286), û "Sivkatî bi serokkomar" (Madeya 376).

Serbarî madene yasaya çapemeniyan ya bi mersûma jimare 50-2001 hatiye derxistin, û madene din yên yasya Parastina Samanê ya bi mersûma yasadana dnê ya jimare 6 roja 7/1/1965 hatiye derxistin, serbarî madeya heştan ya yasaya nav lê tê kirin yasaya Rûbirûbûna Terorê ya sala 2012, û madeya 123 ya yasaya Sizayên Leşkerî, herwiha madeyên 27, 24, 29, 28, 31 yên yasaya Birêxistina Rêsayên Yasayî yên Sizadanê yên Tawana Elektironî ku vê dawiyê derketiye.

Pirojeyasaya mafê bidestxistina zanyariyê ya Huhûmeta Sûriyê

Wezareta Geşepêdana Rêveberî ya Sûriyê sala 2019an pirojeyasa Mafê Bidestxistina Zanyariyê li Sûriyê amade kir, û ji bo wezareta Dadê da ku bi rêya destûrî were pesendkirinê, hat pêşkêşkirin. Armanca piojeyê bicîkirina zelaliyê û pêzanîna hemwelatiyan derbarê karê aliyên giştî, û dana mafê çavdêriyê li ser karê wan, e.

Di reşnivîsê de, yasa ji aliyên giştî daxwaz dike ku zanyariyan li ser sê coran dabeş bikin:

a- Zanyariyên ku ne nihênî ne û bi asayî tîne belavkirin.

b- Zanyariyên ku ne nihênî ne lê ne bi asayî tîne belavkirin, hemwelatî dikare piştî pêşkêşkirina xwestekê, bidest bixe.

c- Zanyariyên ku nihênî ne, û nabe werin belavkirin, dibe ku belavkirina wan bandorê li ser aramî yan sîstema giştî yan aborî û dirava giştî bike, yan ziyane bighîne kesayetiyeye destnîşankirî.

Herwiha pirojeyasayê şeş meh ji bo pêkanîna dabeşkirina navborî terxan kiriye. Yasa 15 rojan herî zêde dide aliyê giştî heta ku bersiva xwestekê bide, lê ji bo ragihandkaran divê di 5 rojan de bersivê bide. Pirojeyasa dibêje ku divê berjewendiyeye xwediyê xwestekê di bidestxistina zanyariyê de hebe, mîna pêwîstiya wî ji bo dozeke dadgehê û divê li gorî fermaneke dadgehî ji bo berjewendiya dadweriyê be. Di vê girêdana navbera mafê rojnamevan di bidestxistina zanyariyan û perjewendiya kesayetî ya yekser de, kêmkirineke vî mafî heye, ango divê ew mafekî serbixwe be negirêdayî hebûn yan nebûna berjewendiyeye yekser be, bingeş mafê xelkê di zanyarî û belavkirina azad ya zanyariyan e.

¹³<https://scm.bz/uncategorized/الاعمال-التكثيل-سورية-حكومية>

Lê, mixabin, ta vê kêlikê jî, ti pêşvebirin derbarê rewşa vê reşnivîsa yasayî, peyda nebûye.

Mafê bidestxistina zanyariyan di yasadanadên desthilata Rêveberiya Xweser ya Rojhilat û Bakurê Sûriyê de

Yasya Ragihandinê jimare 3 sala 2021 û lîsta wê ya cîbicîkar bingeha sereke ya karê ragihandinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, ku ji aliyê Encumena Giştî roja 18ê Gulana 2021 hate pesendkirin. Madeya 10an ya yasayê ku bi sernavê Werzê Mafan e, wiha dibêje:

5- Ji mafê rojnamevanî ye:

a- Li her corê zanyariyan bigere û ji her aliyekî jî bidest bixe û ji mafê wî ye ku tiştê ku bidest bixe, piştî ku ji rastî û bawerpêkiriya wê piştrast be, belav bike.

b- Amadebûna kongir û civat û civînên giştî yên vekirî û belavkirina naveroka wan.

6- Divê alî û sazîyên girêdayî karûbarên giştî rê li ber asankirina erkê ragihandkar di derbasbûna wan alî û sazîyan û bidestxistina zanyariyan, xweş bikin.

7- Nabe ti alî sîordarkirinan ku bidestxistina zanyariyan asteng dîkin, yan newekheviyê di derfeta bidestxistina zanyariyê navbera hemû rojnamevanan de, peyda dike, feriz bike.

8- Ji mafê ragihandkarî ye ku daxwaza zanyarî û nûçe û amarên li ber dest li aliyên peywendîdar bike, eger ev zanyarî li gorî yasayê ne nihênî bin.

Madeya 11 ya bi sernavê Werzê erkan ya yasayê belavkirin yan weşana nûçene nerast yan bangê yan handanê berev bînpêkirina yasayê yan berev tundutûjiyê yan kînê, yan di çarçoveya cêwaziye navbera hemwelatîyan de be yan belavkirina gotara kînê yan handanê, qedexe dike.

Weke ku di destpêka wê de hatiye, Yasa dide xuyakirin ku ew ji bo bîhêzkirina prensîpên azadiya nerîn û derbirînê, û dana azadiyeke bihtir ya kar ji bo rojnamevanan, û ji bo rê li ber qedexekirina bidestxistina wan ji zanyariyan û belavkirin û weşandina wan, bigre, hatiye bicîkirin, ew yek jî li gorî Peymannameya Bingeîn û yasayên li navçeyên Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê tene bicîkirin, e, herwiha yasa ji heft beşan pêk tê, li gorî vê rêzbendiyê: Pênase, prensîpên giştî, pêkhate û erkê rêveberiya ragihandinê, maf û erk, mafê bersivdan û serrastkirinê, serpêçî û sizayên dîspilînî, û hukmine giştî.

Lê yasayê aliyên giştî derbarê destnîşankirina demekê ji bo bersivdana xwesteka kaesê di warê ragihandinê de kar dike, de, neçar nekiriye, tevî ku ji mafê ragihandkar be yan na nerazîbûna xwe li ser biryara aliyê giştî nîşan bide, herwiha nivîsa yasayî tenê ji bo kaseên di warê ragihandinê de kar dîkin de ye, û ti amaje bi hemwelatî yan nişteçêyan nekiriye, tevî ku ev yasa ji yasaya Ragihandinê ya jimare 108 ya taybet bi Hukûmeta Sûriyê yan yasaya nû ya taybet bi Rûbirûbûna Tawanên Elektironî, zanyariyên ku rojnamevan dikare belav bike pir kêmtir qedexe ye.

Mafê bidestxistina zanyariyan di yasadanên navçeyên desthilata Hukûmeta Rizgariyê ya Sûriyê - Bakurê Rojavayê Sûriyê

Desteya desthilat li Bakurê Rojavayê Sûriyê, Hukûmeta Rizgariyê ya Sûriyê ya bi ser Desteya Tehrîr El-Şam ve ye, hejmarek civîn li gel ragihandkarinan ji bo gengeşekirina hurgulî û serrastkirinên Yasaya Ragihandinê jimare 54 ya ku li wê navçeyê tê bikaranîn, lidar xistine, civîna herî dawî jî di 16ê Sibata 2022an de bû, tê pêşbînîkirin ku çapa duyem ya serrastkirî ya vê yasayê di vê salê de derkeve.

Ew yek jî piştî Hukûmetê yasa pesend kir û karpêkirin, feriz kir, bê ku belav bike heta ku kesên di warê ragihandinê li navçeyên desthilata wê de kar dîkin, rêsa û rînimayên wê nas bikin.

Kopîyeke ku bi dizî hatiye belavkirin ku bi mora Serokê Encumena Şewirmediyê ya Giştî hatiye morkirin, gehîştîye destê me, Madeya 3 ya vê yasayê dibêje ku mafê hemwelatî di bidestxistina zanyariyên girêdayî karûbarên giştî de, heye. Hewiha Madeya 4 birgeya 4 dibêje ji mafê ragihandkarî ye zanyariyan bidest bixe û bikar bîne hevdemî berçavbiriba hukmên di vê yasayê de hatine. Madeya 10 ji vê yasayê serbar dike ku aliyên giştî neçar in bersiva xwesteka ragihandkarî derbarê bidestxistina zanyariyan di dema heft rojan de bidin, bersivnedan tê wateya retkirinê, Dadgeha Rêvebirî bi karê xwendina biryara retkirina seranserî yan ya beşekî radibe, û di dema 15 rojan de ji roja gehîştîye dadgehê, biryara xwe distîne. Û ji ber ku nivîsa yasayî bi eşkere nehatiye belavkirin, em nikarin rastiya van madeyan piştrast bikin yan înkâr bikin.

Hêjayî pêzanînê ye ku hin madeyên nivîsa yasayî li navçeya Bakurê Rojavayê Sûriyê hemahema weke yasaya Ragihandinê ya Hukûmeta Sûriyê bi xwe ye, weke ku jê kopîkirî bin. Bi taybet madeya 9: "Corên zanyariyên ku ji mafê aliyên giştî ye eşkere nekin, bi biryareke Encumena Wezîran tên destnîşankirin".

Bi giştî, ya herî xirap li Sûriyê yasa ye. Her madeyek ji madeyên wê cihê comêntê ye, tê de lîsteke dirêj ji bînpêkirinên mafê azadiya desrbirînê û mafê bikaranîna zanyariyan bi azadî, heye. Tenê weke mînak, madeya 9 ya bi sernavê Mafê Rojnamevan, di birgeya wê ya dehan de (Rexnekirina desthilatên xwecihî di dema bîpêkirinan de piştî ku ew yek were piştrastkirin) rexnekirina desthilatê weke rêsayeke giştî ji aliyê rojnamevan ve qedexe dike, û bi tenê rê dide rojnamevan di dema hebûna bînpêkirinan de piştî ku ew yek were piştrastkirin ku rexne bike.

Ji mafê her hemwelatîyekî û ragihandkarekî ye ku rexneya desthilatê bi şewazekî giştî, ji ber gelek sedeman weke sistbûna wê di bicîkirina pilanan yan babetine din de, bike, di civakên demokratîk de ji hemwelatî û rojnamevanan nayê xwestin ku behaneyan ji bo vê rexneyê pêşkêş bikin, eger ne berovajiyê yasayê ji aliyê bikarnehînanan gotara kînê û handana berev tundutûjiyê, yan sivkatiya rûmeta mirovatîyê be. Herwiha ji rojnamevan nayê xwestin ku wê bînpêkirinê piştrast bike, lê belê dibe ku rola wî tenê ronahîxistin li ser rewşine destnîşakirî ku amaje bi hebûna bînpêkirinan bê piştrastkirinê ye û destnîşankirina nasnameya pêkhîner û hebûna bînpêkirinan ji desthilata peywendîdar re dihêle.

Mafê bidestxistina zanyariyan di yasadanên Hukûmeta Demkî û navçeyên dagirkeriya Turkiyê de.

Me nikarî xwe bighînin zanyariyan derbarê hebûna yasayeke taybet bi ragihandinê, yan xaline yasadanên taybet bi rêxistina mafê bidestxistina zanyariyan li van navçeyan.

Lêkolîngeha duyem: Parastina jêderên zanyariyên rojnamevan û ragihandkaran di yasadananên Sûriyê de

Dadgeha Ewropî ya Mafên Mirovan roleke giring di biryardana prensîpa parastina rojnamevanan di eşkerenekirina jêderên zanyariyên xwe de, list, serbarî ku biryarek derxist ku dibêje divê rojnamevan bikarin kamîreyên veşartî ji bo zanyarîdan li ser dozên giring ji bo xelkê, bikar bînin.

Sala (2002) Ddgehê di doza Goodwin de li dijî Şahnişîna Yekgirtî biryara azadiya ne-axaftinê (Mafê bêdengiyê) û mafê bingeîn yê rojnamevanan di eşkerenekirina nasnameya jêderên zanyariyên nihênî, da, û wiha got:

"Parastina jêderên rojnamevanî yek ji mercên sereke yê azadiya rojnamegeriyê ye...¹⁵" û bê vê parastinê, dibe ku jêder ji alîkarîkirina rojamegeriyê di agahdarkirina cemawer derbarê pirsên girêdayî berjewendiya giştî, werin dûrxistin". Û serbar kir ku hewla neçarkirina rojnamevanekî heta ku jêdera xwe ya çîrokeke nûçeyî eşkere bike, bînpêkirina mafê wî di wergirtin û veguhestina zanyariyan de ye, wate mafê azadiya derbirinê. Û Ddgehê wiha got ku fermanên eşkerenekirina jêderan, belavkirina zanyariyan li ser piştî dîmoqratiyê kêmtir dike, anga ji bilî rewşîne pir awarte, ti behabe jê re nînin.

Bêguman, ne ji nêzîk û ne ji dûr em nikarin behsa tişteke derbarê Mafê Bêdengiyê li ti navçeyên Sûriyê bikin, lê li ser asta nivîsa yasadananî, û derbarê mafê rojnamevanan di parastina jêderên zanyariyên wan, û li gorî 62.26% ji rojnamevanên bejdarî lêkolînê bûne, ku yasayên bedrest li navçeyên karên wan gerentiya mafê parastina jêderan, nakin, ew yek weke babeteke pir metirsîdar tê dîtin, nexasim hebûna yasane ku armanca wan berovajiyê wê yekê ye anga ferizkirina eşkerenekirina wan zanyariyan e, weke ku 32.07% ji bejdarbûyên lêkolînê derbarê pîrsa din, dane xuyakirin, parastina yasayî ya jêderan yekem û giringtirîn aste e ji bo rojnamevanan ku dema vê sîbera yasayî jidest bidin dê rastî gelek corên tedabîrên dijber werin, dinav de jî giliyên dadgehî û tedabîrên ewlekarî, tevî ku desthilatên dîfakto bi hemû araste û peywendiyên xwe li Sûriyê azadiyan bînpê dikin, tevî egera hebûna yasne gerentor, lê hebûna yasane dijber ku armanca wan eşkerenekirina jêderan e, dê fişareke bihtir bixe ser azadiya derbirinê û karîna kar ya rojnamevanan herwiha bikaranîna şêwazine ku dibe weke yasayî werin pêzanînê ji bo eşkerenekirina jêderên wan yan tirsandina wan û qedexekirina axaftina wan dihêle tirs li cem wan jêderan derbarê veguhestina zanyariyên zindî û giring bo rojnamevanan heta ku wan zanyariyan belav bikin û hemwelatiyên Sûriyê pê agehdar bikin, bihtir bibe.

Li gorî agahiya te, yasayên bedrest yên li navçeya te, mafê parastina jêderên rojnamevanan, gerentî dikin?	Rêje%	Dubare
Belê	11.32%	6
Nexêr	62.26%	33
Ez nizanim	26.41%	14
Kom	100%	53

¹⁵ <https://globalfreedomofexpression.columbia.edu/cases/goodwin-v-united-kingdom/>

Ji aliyê praktîkî ve, bersivên kesên li navçeyên Sûriyê yê coracor kar dikin, li ser rapirsînê, valahiya mezin navbera tiyori û bicîkirinê de, piştrast dikin.

Ti caran, tu rastî fişarê ji aliyê desthilatên xwecihî li navçeya te ji bo eşkerenekirina jêderên xwe yên rojnamevanî, hatî?	Rêje%	Dubare
Belê	62.26%	33
Nexêr	37.73%	20
Kom	100%	53

Li ser asta bilogên yasayî, madeya 7/b-ya Yasaya Ragihandinê ya ku bi merûma yasadananî jimare 108 sala 2011an derketiye, bi zelalî û bêgumanî amaje bi mafê rojnamevan di parastina jêderên zanyariyê xwe de, kiriye: Nabe ti alî daxwazê ji ragihandkar bike ku jêderên zanyariyên xwe eşkere bike, tenê bi rêya dadweriyê û di civateke nihênî de dibe.

Hêjayî pêzanînê ye ku Yasayê di madeya xwe ya çaran de amaje kiriye ku karê ragihandinî bikaranîna alavên ragihandinê ji bo danîna naverokên ragihandinî yê ku ne wek peywendiyên kesayetî tene dîtin, li ber destê hemû xelkê yan li ber destê beşekê jê ye, li gel berçavbirina prensîpên sereke ku behsa giringiya rêzgirtina Peymannameya Rûmeta Rojnamevanî ku ji aliyê Yekîtiya Rojnamevanan ve hatiye derxistin, dike. Madeya 50-a ya Yasaya Yekîtiya Rojnamevanan li Sûriyê sala 1990 wiha dibêje: Nabe rojnamevan derbarê eşkerenekirina jêderên zanyariyên xwe were neçarkirin, ew yek jî divê di sinorê yasayê de be, ew yek jî di madeya 105 ji Peyroya Navxwe ya Yekîtiya Rojnamevanan de hatiye dubarekirin.

Li aliyekî din, Peymannameya Rûmetê ya Ragihandkarên Sûriyê (ya sala 2015) di madeya xwe ya pêncan bi ser navê Erkên Rewîşteyî yê Ragihandkar hevsengî navbera giringiya belgekirina zanyariyên ragihandkarî û jêderên wan û navbera pêwîstî û mafê parastina jêder, peyda kiriye, ku wiha dibêje: t-5: eşkerenekirina jêderan û destnîşankirina wan bi wirdî, û amajekirin bo sedemên eşkerenekirinê di dema pêwîstiya veşartinê hebe, û parastina jêder û şahidhalan, û eşkerenekirina kesayetiyên wan, ji bilî istisnayên giring yê yasayî.

Lê di Yasaya Ragihandinê jimare 3 sala 2021 de ku karê ragihandinî li navçeyên Rêveberiya Xweser ya Rojhilat û Bakurê Sûriyê birêk dixwe, ku roja 18ê Gulana 2021 hatiye pesendkirin, madeya (3/10) ji wê yasayê û bi şêwazekî wird, wiha dibêje: Ji bilî dadweriyê, ne ji mafê ti aliyî ye ku daxwazê ji ragihandkar bike jêderên zanyariyên xwe eşkere bike. Ev nivîs ya herî nêzîkî peymannameya Rûmeta Ragihandkarên Sûriyê ye ku ti desthilat li ser desthilata rojnamevan û serbixweyiya wî ya pîşeyî re ji bilî desthilata dadweriyê tune. Tevî wê yekê jî, ev herdu nivîs girêdayî asta serbixweyi û destpakiya dadweriya karpêker, dimînin. Weke berawirdkirinekê, li Urdunê Yasa¹⁶ mafê rojnamevan di eşkerenekirina jêderên zanyariyê xwe li pêşiya dadweriyê jî diparêze, Yasaya Çapemenî û Belavkirinê ya Urdunî jimare 8 sala 1998 û serrastkirinên wê, di madeya xwe ya şeşan de dibêje ku azadiya rojnamegeriyê

¹⁶ <http://www.lob.jo/?v=1.14&url=ar/LegislationDetails?LegislationID:2000.LegislationType:2.isMod:false>

van xalan jî li xwe digre:

c-Mafê bidestxistina zanyarî û nûçe û amarên giring ji bo hemwelatîyan ji jêderên wan yên corbîcor, û çîrovekirin û bikaranîna, û belavkirina wan, û komêntkirinê.

d-Mafê çapemenî û rojnamevan ku jêderên zanyarî û nûçeyên ku bidest xistine, weke nihênî bimînin. Hêjayî pêzanînê ye ku beriya 2007 movika navborî wiha dogot "Ji bilî li pêşîya dadweriyê di dozeke sizayî de", û ev riste di serrastkirineke yasayî de hat jêbirin.

Herwiha madeya (8-h) dibêje: Destwerdan di her karekî ku rojnamevan di çarçoveya pîşeya xwe de dike yan xistina bandorê li ser wî yan neçarkirina wî ji bo eşkerekirina jêderên zanyariyên xwe, qedexe ye, dinav de jî bêparkirina wî bê sedemeke yasayî yan behanekirî ji karê wî yan ji nivîsandinê yan ji belavkirinê, hevdemî destwernedane di desthilata sernivîser di standina biryara belavkirin yan nebelavkirinê de, weke ku tê naskirin. Ango- weke ku ji herdu nivîsên navborî tê xuyakirin- mafê rojnamevanan di parastina jêderên xwe, mafekî sereke ye Absolute privilege...

Ji aliyekî din ve, kopîya kaxezî ya hetîye belavkirin amaje wiha pê kiriye ku ew kopî Yasya Ragihandinê jimare 54 ku li Bakurê Rojavayê Sûriyê karpêkirî ye, movika duyem ji madeya wê ya heftan dibêje ku nabe ti alî daxwazê ji ragihandkar bike ku jêderên zanyariyên xwe eşkere bike, ji bilî ku bi rêya Rêvebriya Giştî ya Ragihandinê, û di civîneke nihênî de be, yan eger ti tawan nebin, bi rêya dadweriyê jî dibe.

Li gorî madeya 9 ji yasayê, divê aliyên giştî rê li ber bidestxistina zanyariyan ji aliyê rojnamevanan ve xweş bikin, zanyariyên ku nabe werin eşkerekirin bi biryareke Encumena Wezîran, tên destnîşankirin. Careke din, em tekez dikin ku ji ber ku bi eşkere ev yasa nehatiye belavkirin, em nikarin vê reşnivîsê/ kaxezê piştrast bikin yan piştrast nekin, tevî ku li gorî hin ragihandkarên ku li wê navçeyê kar dikin, heta ku rojnamevan karta xwe ya rojnamegeriyê ji Rêveberiya Giştî ya Ragihandinê bidest bixe, divê li ser belgeyeke neçarkirina pabendîya wî bi peymannameya Rûmetê û Yasaya Ragihandinê, imze bike, ku rojnamevanan bi xwe ew yasa nedîtîbûn û piştî ku qerebalixek li ser vê dozê encam dan, ji nû ve dîtin, weke ku ji navendê re hatiye gotin!

Hêjayî pêzanînê ye ku rapirsînê bi zelalî lawaziya zanînê bi hebûna van bilogên yasayî li cem kesên di warê ragihandinê de li hemû navçeyên Sûriyê, kar dikin, û bi rêjeyên jiyawaz, da xuyakirin, Weke mînak, civînen şewermendiyê dane xuyakirin ku kesên li navçeyên Rêveberiya Xweser di warê ragihandinê de kar dikin ji kesên li navçeyên kontirola Hukûmeta Sûriyê kar dikin, bihtir agehdar in, lê lawaziya zanînê bi şewazekî sereke bi nekarabûna van bilogên yasayî û jikarketina wan û mana wan bilogan weke sar di rewşeke nîv-ne-amade derbarê her hebûneke piraktîkî li ser asta cîbicîkirinê, girîdayî dimîne.

Ti bilogên yasayî li navçeya te hene ku li ser rojnamevanan bi şeweyek nihênî yan eşkere, feriz dikin ku jêderên xwe eşkere bikin?	Rêje%	Dubare
Belê	32.07%	17
Nexêr	35.84%	19
Ez nizamim	32.07%	17
Kom	100%	53



Werzê sêyem: Encamên rapirsîna li ser mafê bidestxistina zanyariyan û parastina jêderên rojnamevaniyê li Sûriyê

Pêşekî:

Tîma Navenda Sûriyê ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê bi hevkarî li gel lêkolînerê serbixwe `Urwa Xelîfe rapirsîneke taybet bi rojnamevanan li Sûriyê û welatên derdor kar dikin (Türkiye û Urdun û Lubnan û Îraq), yên ku li jêr desthilata hêzine corbîcor li giyografiya welêt de kar dikin, amade kir, rapirsîn bi şeweyekî sereke ji bo rojnamevanan hate şandin:

Rojnamenivîs û sernivîserên kenalên tilivîzyonî û peyamnêrên xwecihî, û derfet tenê ji bo bejdariya derhêner û teknîkarên di warê wênegirtinê de kar dikin, hat dan, lê ti kes ji vî warî bejdar nebû. Rapirsînê kesên bizimanê kurdî yan erebî yan bi herdu zimanan kar dikin, li xwe girt, serbarî berçavbirina hevsengiya cenderî, armanca rapirsînê dîtina nerînên wan derbarê herdu dozên azadiya gehîştin bo zanyariyan û parastina jêderên rojnamevanî bi mebesta têgihiştineke berfirehtir ya çalencên girêdayî van herdu babetên pir giring ji bo karê rojnamegerî û azadiya derbirînê li Sûriyê, bû.

Rapirsîn piştî encamdana du civatên gengeşeyî yên balkişandinê li gel rojnamevanine Sûrî ji hemû navçeyên Sûriyê, hat amadekirin, civata yekem bi amadebûna kesayetî li nivîsgeha Navendê li Bakurê Rojhilatê Sûriyê bû, û ya duyem bi rêya internê jî bo rojnamevanên ji navçeyên din ên Sûriyê bû.

Rapirsîn piştî berçavbirina pêşînyar û serbarkirinên ku di gendêşeyên balkişandinê de hatin pêşkêşkirin, hat amadekirin, û ji bo 110 rojnamevan û rojnameyê bi rêya Emailê hat şandin, Nimûneya lêkolînê ji hejmarek rojnamevanên mê (17%) û rojnamevanên nêr yên Sûriyê ku li navçeyên corbîcor yên Sûriyê û li welatên derdor û Ewropayê dimînin, û kar li ser romalkirina nûçe û çîrokên rojnamevanî ji hundir û derveyê Sûriyê, dikin, pêk hat. 53 rojnamevan û rojnameyê dinavbera dawîya Kanûna duyem û dawîya Sibata 2022 bersiva rapirsînê dan.

Rapirsîn li ser du beşan hat dabeşkirin: Beşê yekem dozên girêdayî mafê bidestxistina zanyariyan ji bo rojnamevanan, gengeşe kir, û beşê duyem parastina jêderên rojnamegerî gengeşe kir.

Dabeşkirina nimûneyê:

Xiştêyên jêrîn dabeşkirina nimûneyê li gorî cender, asta xwendinê, û temen, û navçeyên nişteçêbûnê, û navçeyên ku rojnamevan di romalên xwe yên rojnamevanî de balê li ser dikişînin, didin xuyakirin.

Dabeşkirina cenderî ya nimûneyê bilindiya rêjeya rojnamevanên nêr bi şewazekî mezin bi berawirdî li gel rêjeya rojnamevanên mê yên ku bersiva rapirsînê dane, da xuyakirin, tevî ku ji aliyê cenderî ve Navenda Sûriyê ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê hevsengî di lîsta Emaila ku hatiye şandin de peyda kir, lê rêjeya rojnamevanên mê yên bersiva rapirsînê dane ne bihtirî 20% ji koma rojnamevanên ku bersiv dane bû.

Dibe ku ev rêje nîşana wê yekê dide ku tirsek li cem rêjeyek ji rojnamevanên mê yên Sûriyê derbarê danûstandin li gel babetine hestiyar weke yên di rapirsînê de hatine, heye, herwiha dibe ku nîşana wê yekê be ku bi giştî-dibe ku ne wird be-mêran bi şêwazekî mezin dest danîne ser pişeya rojnamegeriyê li Sûriyê, serbarî hebûna rewşine dûrker ji jinan re mîna metirsiyên ewlekari û rewşên şer û gelek sedemên din ku dibe ku pêwîstî lêkolîneke cuda bin.

Derbarê dabeşkirina rojnamevanên ku bersiva rapirsînê dane, piraniya wan ji hundirê Sûriyê bûn ango 67.92% herwiha pileya duyem ya rojnamevanên ku li Turkiyê dimînin bû, welatên din yên derdor û Ewropa di pileyên dawiyê de bûn.

Bihtirî nivê rojnamevanên bersiva rapirsînê dane, hilgirên bawernameyeke zanîngehê bûn, hilgirên bekeloriya di pileya duyem de bûn, û rêjeya hilgirên bawernamene bilind (Master yan Duktora) ne bihtirî 7.54% ji koma nimûneya lêkolînê bû, derbarê girûpa temenê bejdarbûyên lêkolînê, piranî navbera 25 sal ta 35 salan bûn, bi rêjeya 56.60 ji koma nimûneyê.

- Ev xîşte dabeşkirina nimûneya rapirsînê li gorî cenderê dide xuyakirin:

Cender	Rêje%	Dubare
Nêr	81.13%	43
Mê	18.86%	10
Kom	100%	53

- Ev xîşte dabeşkirina nimûneya rapirsînê li gorî navçeya nişteçêbûnê dide xuyakirin:

Navçe	Rêje%	Dubare
Sûriye	67.92%	36
Turkiye	16.98%	9
Erbîl	1.88%	1
Lubnan	5.66%	3
Urdun	3.77%	2
Ewropa	3.77%	2
Kom	100%	53

- Ev xîşte dabeşkirina nimûneya rapirsînê li gorî asta xwendinê dide xuyakirin:

Asta xwendinê	Rêje%	Dubare
Bawernameyeke Bekeloriya	30.18%	16
Bawernameyeke Zanîngehê	62.26%	33
Xwendina Bilind	7.54%	4
Kom	100%	53

- Ev xîşte dabeşkirina nimûneya rapirsînê li gorî navçeya ku bala kar li ser dikişînin dide xuyakirin:

Navçeya ku bala kar li ser dikişînin	Rêje%	Dubare
Navçeyên desthilata Hukûmeta Sûriyê	30.18%	16
Navçeyên desthilata Hukûmeta Rizgariyê ya Sûriyê	39.62%	21
Navçeyên karîgeriya Turkiyê	9.43%	5
Navçeyên desthilata Rêveberiya Xweser	20.75%	11
Kom	100%	53

- Ev xîşte dabeşkirina nimûneya rapirsînê li gorî girûpa temen dide xuyakirin:

Girûpa temen	Rêje%	Dubare
18 sal ta 25 sal	11.32%	6
26 sal ta 35 sal	56.60%	30
36 sal ta 45 sal	28.30%	15
46 sal ta 55 sal	3.77%	2
Kom	100%	53

Beşê yekem: Mafê bideŝtixistina zanyariyan

Pirisyarên vî beşî hewl didin ku serederiyê li gel xuyatirîn çalencên ku rastî rojnamevanan di dema gehşitin bo zanyariyan ji jêderên fermî û nefermî, bikin, dinav wan çalencan de û ya sereke, nebûna yasane karpêker ku bi rastî têne bicikirin ku rê li ber rojnamevanan ji bo gehşitin bo zanyariyan xweş dikin, serbarî hestên wan bi ne-aramiyê di wê piroseyê de, herwiha dinava pirsan de nîşander derbarê rola saziyên rojnamevanî di piştevaniya gehştina rojnamevanan bo zanyariyan, û nîşander derbarê sanahiya gehştina bo zanyariyan li navçeyên wan, hebûn

Hin welat şêweyekî nihênîyê ku girêdayî demeke destnîşankirî ye li ser hin datayên ku dibe ku bandorê li ser ewlekariya giştî yan peywendiyên wan yên diplomasî bikin, feriz dikin, lê yasayên Sûriyê yên ku nihênî û qedexeya belavkirinê derbarê babetine corbicor, feriz dikin, girîdayî ti demeke destnîşankirî nînin, piraniya caran ew yek ji aliyê desthilatên dîfakto ve weke behane ji bo girtina rojnamevanan tê bikaranîn, tevî ku dibe ku wan rojnamevanan serederî li gel wan corên zanyariyên qedexekirî nekirine, ew yek tê wateya ku hebûna vî corê yasayê li Sûriyê, îro weke yek ji alavên bînpêkirina azadiya rojnamegeriyê tê bikaranîn, û ne ji bo birêxistina datayên hestiyar yên ku dibe ku bandorê li ser ewlekariya giştî li welêt bikin.

Li navçeya te, hin zanyarî hene ku yasayên berdest gehştin bo wan zanyariyan yan belavkirina wan qedexe dike?	Rêje%	Dubare
Hene	64.15%	34
Tunene	5.66%	3
Ez nizanim	30.18%	16
Kom	100%	53

Derbarê çalencên rastî rojnamevanan li Sûriyê ji bo gehştin bo datayan tîn, besrivên li ser pirsên ku pir bijarde ne, bi şêwazekî sereke tekezî li ser çalenca ewlekarî kirin, 77.35% ji bejdarbûyên lêkolînê ew bijarde hilbijartine, di pileya duyem de çalenca madî bû bi rêjeya 41.50%, wateya çalenca madî ji bo rojnamevanan peydabûna alavên madî heta ku bikarin karên xwe bi baştirîn şêwe bicî bînin, mîna hebûna têçûyên veguhestin û çûnûhatinan.

Rapirsînê tişteke nû neanî holê, ango bi asanî tê pêşbînîkirin ku çalenca ewlekarî di karên rojamevanan de ya herî xuyayî ye, bi taybet dema hewla gehştinê bo zanyariyan didin, nexasim di sîbera karên bînpêker ji azadiya derbirinê re ji aliyê hemû desthilatên dîfakto li Sûriyê.

Tu weke rojnamevan, dema tu hewla bideŝtixistina zanyariyên fermî li navçeya xwe dikî, xuyatirîn çalenc rastî te tîn, çi ne? (Pirseke pir bijarde)	Rêje%	Dubare
Çalencine ewlekarî	77.35%	41
Çalencine yasayî	18.86%	10
Çalencine madî	41.50%	22
Çalencine din yên teknîkî	30.18%	16

Bi heman araste, 77.35% ji bejdarbûyên rapirsînê dane xuyakirin ku çareserkirina çalenca ewlekarî dê rê bide wan ku rê li ber gehştinê bo zanyariyan kurt bikin, ev coş bi şêwazekî bêhempa li cem hemû rojnamevanên ku li Sûriyê kar dikin heye, herwiha li cem kesên di pirsê Sûriyê de li welatên derdor jî kar dikin heye, ew yek dihêle ku em bihtir li ser kêmbûna bînpêkirinên li dijî rojnamevanan li navçene destnîşankirî di salên borî de, rawestin, dibe ku ew yek wiha were şirovekirin ku başbûna azadiya derbirinê li wan navçeyan ji encama metirsiyên rojnamevanan û fêrbûna wan ji waneyên dijwar û temenên ku hevpişeyên wan berê dane ye.

Bihtirîn çalenca ku rastî çareserînan were dê çalencên ku rastî te di dema gehştin bo zanyariyan tîn, kêmbibin?	Rêje%	Dubare
Çalenca ewlekarî	77.35%	41
Çalenca yasayî	9.43%	5
Çalenca madî	7.54%	4
Çalenca civakî	5.66%	3
Kom	100%	53

Ji aliyekî din ve, cihekî giring yê peywendiya li gel civaka xwecihî li cem rojnamevanan heye, ji ber ku ev peywendî yek ji alavên wan yên sereke ye ji bo gehştinê bo zanyariyan, 43.39% ji bejdarbûyên rapirsînê dibînin ku ev peywendî bi şêwazekî nîvenîv bandorê li ser karîna gehştinê bo zanyariyan dike, û 24.52% ji wan dibînin ku bandoreke mezin dike. Kêşe û çalencên rastî rojnamevanan di peywendiya wan li gel civakên xwecihî de tîn, nexasim di serdemên kirîz û ji encama hilmetên handana li dijî wan - bi piştevaniya desthilatên dîfakto ji aliyê kesên zerermend ji belavkirina van dadta û zanyariyên rasteqîne - babeteke giring e dema behsa azadiya gehştinê bo zanyariyan tê kirin, ev peywendî bandorê li ser arezûya berpirsên xwecihî ji bo berdestkirina zanyariyan, dike, civaka xwecihî li Sûriyê yek ji jêderên giring yên wan zanyariyan e ji ber zehmetiya gehştinê bo wan zanyariyan ji jêderên rasterast yên fermî, piraniya caran.

Pewendiya te li gel civaka sivîl bandorê li ser karîna te weke rojnamevan li ser gehîştin bo zanyariyan dike?	Rêje%	Dubare
Bandoreke kêr	32.07%	17
Badorê nîvenîv	43.39%	23
Bandoreke mezin	24.52%	13
Kom	100%	53

Derbarê hebûna sazî yan karmendine fermî yê desthilatên dîfakto ku erkê wan rêxweşkirina piroseya gehîştinê bo zanyariyan li navçeyên karê rojnamevanên bejdar di lêkolînê de, 60.37% ji wan gotin ku hevşeweyê van saziyan hene, lê derbarê pîrsa din, nerîna rojnamevanan derbarê asta karê wan saziyan, pîr xirab bû, 56.25% ji wan dibînin ku karê wan saziyan lawaz e û 43.75% ji wan dibînin ku asta karê wan saziyan nîvenîv e, lê ti bejdarbûyekî bijardeya asta karê baş hilnebijart.

Gelo sazî yan karmendine fermî yê desthilatan li navçeya te ku erkê wan pêşkêşkirina hesankariyan bo rojnamevanan ji bo gehîştinê bo zanyariyan, hene?	Rêje%	Dubare
Heye	60.37%	32
Tuneye	39.62%	21
Kom	100%	53

Gelo asta karê sazî yan karmendê fermî û karîna wan ji bo peyda kirina zanyariyan bo rojnamevanan çî ye?	Rêje%	Dubare
Lawaz e	56.25%	18
Nîvenîv e	43.75%	14
Baş e	0%	0
Kom	100%	32

Beşê duyem: Parastina jêderên rojnamegeriyê

Di vî beşî de, pîrsên taybet bi çalancên rastî rojnamevanên Sûriyê ji bo parastina jêderên zanyariyên xwe tên, hatin pêşkêşkirin, herwiha mezimtirîn rêgir li pêş wan ji bo heman mebestê çî ne, eger çalencên ewlekarî, yan yasayî, yan civakî yan çalenc û kêşene bin ku rasî wan di wê çarçoveyê de tên, çalenca ewlekarî ji aliyê piraniya bejdarbûyan ve weke xuyatirîn çalena ku di parastina jêderên rojnamegeriyê de, rastî rojnamevanan tê, hatiye hilbijartin.

Bersivên rojnamevanan dîde xuyakirin ku piştevaniyeke baş ji aliyê saziyên ragihandinê ve derbarê parastina jêderên rojnamevanî, heye, 71.69% ji wan gotine ku li saziyên wan tedabîrine standart ji bo parastina jêderên rojnamevanî, hene, dibe ku hebûna hevşeweyên van tedabîran bi awayekî mezin li cem saziyên rojnamevaniyê yê ku li Sûriyê kar dikin, vedigere nebûna piştevaniya ti parastinekê ji aliyê yasa yan desthilatan ji bo vê babetê, dibe ku piraniya caran, berovajiyê wê yekê jî be, ango desthilat hin yasayan li ser rojnamevanan feriz dikin ku wan neçar dikin jêderên zanyariyên xwe eşkere bikin.

Bersivên pîrsa din, vê yekê zelal dikin, ku 62.26% ji bejdarbûyan gotine ku ew rastî fişarê ji aliyê desthilatên xwecihî ve li navçeyên karên wan ji bo eşkere kirina jêderên zanyariyên xwe, hatine, lê dema em behsa fişarên ji aliyê civaka xwecihî ve ji bo eşkere kirina jêderan, bikin, ev rêje bi şeweyekî mezin kêr dibe, ku 39.62% ji bejdarbûyan gotine ku ew rastî hevşeweyê van fişaran ji aliyê civakên xwe ve hatine.

Gelo saziya te ya rojnamevaniyê ti tedabîrên standart yê li ser erêkirî ji bo parastina jêderên te yê rojnamevanî distîne?	Rêje%	Dubare
Belê	71.69%	38
Nexêr	28.30%	15
Kom	100%	53

Gelo tu carinan rastî fişarê ji aliyê civaka xwecihî ve li navçeya te ji bo eşkere kirina jêderên te yê rojnamevanî, hatyî?	Rêje%	Dubare
Belê	39.62%	21
Nexêr	60.37%	32
Kom	100%	53

Weke di beşê borî ên pirsan de, piraniya rojnamevanên bejdar di lêkolînê de gotine ku çalenca ewlekarî ya herî xuyayî ye dinava çalencên ku rastî wan ji bo parastina jêderên xwe, tê, 86.79% ji wan ev çalenc weke yek ji wan çalencan dinava pirseke pir bijarde de, hîlbijastine, çalencên yasayî di pileya duyem de bi rêjeya 43.39% bû.

Xuyatirîn çalenca ku rastî te ji bo parastina jêderên te yên rojnamevanî tê, çi ye? (Pir bijarde)	Rêje%	Dubare
Ewlekarî	86.79%	46
Teknîkî	28.30%	15
Yasayî	43.39%	23

Derbarê nîşander, 67.92% ji bejdarbûyan dibînin ku parastina jêderên wan babeteke pir zehmet e ango bijardeya 1 heta 3 ji vê nîşanderê ku tê wateya zehmetiyên parastina jêderên rojnamevanan, hîlbijartine, ev yek jî arasteyeke giştî bi rêya şirovekirina bersivdana nimûneya lêkolînê dide xuyakirin ango metirsiyên ewlekarî û çalencên ewlekarî û yasayî û madî rêgir in li ber parastina rojnamevanan ji jêderên xwe re yan gehiştin bo zanyariyên wird.

Bi pîvana 1 heta 5, ku 1 tê wateya tu qet nikarî jêderên zanyariyên xwe veşêrî yan biparêzî û 5 tê wateya tu bi şêweyekî yasayî û aram dikarî jêderên rojnamevanî biparêzî, tu karîna xwe ji bo parastina jêderan li navçeya xwe, îro, çawa dibînî?	Rêje%	Dubare
1	5.66%	3
2	28.30%	15
3	33.96%	18
4	18.86%	10
5	13.20%	7
Kom	100%	53



Rasparde

Li gorî çarçoveya derbasbûyî, û bi guncawkirinê li gel arasteya navdewletî di yasakirina mafê bidestxistina zanyariyan de:

- Divê mafê bidestxistina zanyariyan, herwiha mafê rojnamevnan di parastina jêderên xwe de, têkeve nava pîlanên çaksaziya destûrî û saziyane ya pêşerojê de. Serbarî karakirina rola rêxistinên civaka sîvil û bihêzkirina karînen wan di warên rahênana karmendên giştî de, û bilindkirina asta kêrhatiya rojnamevan û ragihandkaran di warê çanda yasayî de.
- Ango yek ji baştirîn ezmûnên navdewletî derbarê rola rêxistinên civaka sîvil di belavkirina çanda bidestxistina zanyariya de, ezmûna Bulxariya û Hindistanê ye. Li Bulxariyayê rêxistineke civaka sîvil ahengek ji bo mafê zanîne di 28ê Îlûna 2003an de lidar xist, û piştî Desteya Giştî ya Neteweyên Yekgirtî ew roj weke rojeke navdewletî bi navê Roja Cîhanî ya Mafê Zanîne destnîşan kir.
- Herwiha Ew rêxistin dikarin komek çalakiyên alîkar di pêşxistina hêza mafê bidestxistina zanyariyan encam bidin, dînv de jî çalencên yasayî (Bilindkirina dozan li pêş dadgehan).
- Herwiha ev rêxistin dikarin hîlmetine hişiyarîkirin û palpiştîyê advocacy derbarê giringiya hebûna hevşêweyên vê yasayê û çawaniya bikaranîna wê û pêşkêşkirina xwestekan, encam bidin, û Roja Cîhanî ya Mafê Zanîne (28/9 ji her salê) bi rêya encamdana çalakîne corbicor bi mebesta belavkirina mafê zanîne, vejînin.
- Rahînan jî weke navçeyeke hevkariyê ya firehalî navbera berpiran û civaka sîvil de dimîne, nexasim rêxistinên ne-Hukûmî, saziyên akademî.

Roja Cîhanî ya Mafê Zanîne

Bîrokeya Roja Cîhanî ya Mafê Zanîne roja 28ê Îlûna her salê ya Rêxistineke Civaka Sîvil (AIP) sala 2003 li Bulxariyayê bû, ku ahengek ji bo radestkirina Kilîla Zêrîn ji bo saziya ku bi karayî zanyariyan dide daxwazkaran, tê lidarxistin, Herwiha xelata Qûfla Zêrîn ji bo saziya ku erkê xwe ji bo eşkerekirina zanyariyan bicî nake, tê radestkirin. Êdî ev roj bi bîrîyareke Neteweyên Yekgirtî bû rojeke navdewletî.

Wêne ji malpera Rêxistina (AIP) ye



Werzê çaran Nivîsa pêşinyarkirî ji bo pirojeyasaya bidestxistina zanyariyan li Sûriyê

Setokkomar

Li gorî hukmên destûrî. Û li gorî biryarên ku Encûmena Gel di civata xwe xwe ya lidar xistî ... Ev yek hat standin:

Made	Nivîseke şûngir	Sedemên nivîsê
Made-1 Ev Peyv û zarwazên han di her cihê vê yasayê de werin, van wateyên taybet didin xuyakirin, ji bilî ku eger axaftin bi wateyeke din be:- Zanyarî: Her datayeke devkî yan nivîskî yan tomar yan amar yan belgene nivîskî yan wêneyî yan tomarkirî yan elektironî hatibin qeydkirin yan bi her şêweyî û li jêr rêveberiya saziyê de be. Belgeyên dabeşkirî: Her zanyariyeke devkî yan belgene nivîskî yan çapkirî yan elektironî qeydkirî bin yan bi her şêweyeke din be yan kasêtên tomarkirinê yan wêneyên tavi û film yan çart yan hevşêweyên wê ku weke nihênî yan belgene li gorî hukmên yasadananên cîbicîkar parastî ne, hatine dabeşkirin. Belgeyên asayî: Her zanyariyeke ku ne li jêr rêveberiya saziyê hatiye dabeşkirin. Sazî: Wîzaret yan desthilat yan Deste yan her saziyeke giştî yan saziyeke fermî giştî yan her kompaniyeke ku rêveberiya cihekî giştî dike û kompaniyên ku dewlet yan her aliyekî navborî bi rêjeyeke bihtir ji 50% ji serdirava xwe hevpar be yan her kesayetiyeye yasayî ku piştewaniya darayî ya seranserî yan beşekî ji hukûmetê yan ji aliyekî biyanî dibe. Berpirs: Serokwezîr yan wezîr yan serokê Encumena Zanyariyan yan Rêvebirê giştî yê saziyê. Encumen: Encumena Zanyariyan ku li gorî hukmên vê yasayê hatiye avakirin. Serok: Serokê Encumenê	Belgeyên dabeşkirî: Her zanyariyeke ku weke nihênî yan belgene li gorî yasadananên cîbicîkar hatine dabeşkirin. Berpirs: Serokwezîr yan wezîr yan serok yan Rêvebirê giştî yê saziyê yan nûnerê yasayî yê kompaniyê yan kesê yasayê. Serok: Serokê Encumenê (Dadwerekî berê di dadgeha Kasasiyonê yan di dadgeha Rêveberî de).	Mînak Nihênîyên leşkerî û baregehên nihênî yên Encumena Wezîran û naverokên civatên nihênî yên Encumena Gel,

Made	Nivîseke şûngir	Sedemên nivîsê
Made 2- a- Hemû zanyariyên li cem saziyên giştî cihê pêzanînê ne, ji bilî zanyariyên ku dikevin çarçoveya istisnayên destnîşankirî yên vê yasayê de. b- Ji mafê her hemwelatîyekî Sûriyê yan hemwelatîyekî yasayî yê Sûriyê ye ku zanyariyan di sînorê yasayê de bidest bixe.	b- Ji mafê her kesekî asayî yan yasayî yan niştecih li Sûriyê ye ku zanyariyan di sînorê yasayê de bidest bixe.	Eger zanyarî ji eşkerekirinê istisna be, wê demê ne ji mafê hemwelatîyê Sûriyê û ne ji ti kesekî din e ku bidest bixe.
Made 3: Nabe bidestxistina zanyariyan mafê kesên din û navbangiya wan di rûmet û yasayê de bînpê bike. Yan zîyanê bigîne azadî û mafên sereke yên di destûrê de hatine.	-	-
Made 4- a- Li gorî vê yasayê, Encumenek bi navê (Encumena Zanyariyan) ji bo şeş salan ku nayê nûkirin tê avakirin, ku ji neh endaman pêk tê û tê de nûneratiya jinê tê berçavbirin, bi vî awayî: 1- Serok: (Dadwerekî berê di dadgeha Kasasiyonê yan di dadgeha Rêveberî de) û ji aliyê Encumena Gel vet ê hîlbijartin. 2- Rêpêderê zanyariyan weke cîgirê serok ku ji aliyê hukûmetê ve tê berbijêrkirin û Encumena Gel li ser erikkirina wî pesend dike. 3- Neqîbê parêzeran Endam. 4- Neqîbê Rojnamevanan Endam. 5- Nûnerê ji Rêveberiya amaran. 6- Nûnerê ji desteya Tîknolojiyaya Zanyariyan. 7- Sê endam ji Civaka Sîvîl yên xwedî pisporî û şarezayî û ji aliyê Encumena Zanyariyan ji nava şeş berbijêrên ku Serokê Encumena Zanyariyan wan destnîşan dike, têne hîlbijartin. b- Xelata Serok û endamên Encumenê bi biryareke Encumena Wezîran tê destnîşankirin. c- Encumena Zanyariyan weke aliyê ku li mafê her kesê ku xwesteka wî ji bo bidestxistina zanyariyan hatiye retkirin, xwedî derdikeve.	3- Li gorî binavkirina ku dê Encumena Niştîmanî ya Ragihandinê pê were avakirin.	-

Made	Nivîseke şûngir	Sedemên nivîsê
Made 5: Encumen xwedî van erk û desthilatan e: - a- Gerentiya dana zanyariyan bo pêşkêşkaran di sînore vê yasayê de. b- Amadekirina formekê ji bo xwesteka bidestxistina zanyariyan. c- Xwendina giliyên ku ji aliyê daxwazkarên bidestxistina zanyariyan û kar ji bo serrastkirina wan giliyan li gorî rênimayne ku ji bo vê mebestê dê derxîne. d-Amadekirin û derxistina rênimayên girêdayî pejirandin û serrastkirina giliyan. h- Encamdana çalakîyên guncaw ji bo bihêzkirina çanda mafê bidestxistina zanîn û zanyariyan. u- Amadekirina raporta salane derbarê bicîkirina mafê bidestxistina zanyariyan û belgekirina bînpêkirinan û belavkirina raport û lêkolînan derbarê rêgiriya li ber bicîkirina mafê pêzanîn û çawaniya tune kirina wan rêgiriyan, û bilindkirina wan bo Serokê Wezîran û Serokê Encumena Gel û belavkirina wan li ser malpera elektironî ya Encumenê û li ser alavên ragihandinê.	-	-
Made 6- a- Herî kêrî carekê di mehê de Encumen dicive yan dema pêwîst be bi vexwendinekê ji Serok yan cîgirê wî dema ew neamade be yan bi daxwazekê herî kêrî ji pênc ji endamên Encumenê ji bo gengeşkirina babetên ku di vê vexwendinê de hatine. b- Civîn bi amadebûna herî kêrî pênc endaman dinav wan de serok yan cîgirê wî, yasayî dibe, biryar bi piraniya dengên endamên Encumenê tên standin, eger deng yeksan bin, wê demê aliyê ku serok dinav de deng daye, biser dikeve. c- Ji mafê Encumenê ye ku her kesê xwedî pisporî û şarezayî ji bo civînan xwe vexwîne, bê ku mafê wî di dengdanê li ser standina biryaran de hebe. d- Eger endamek rastî rewşeke fedîkariyê were, wê demê tiştê ku li ser dadweran bicî dibe, li ser serok û endamên Encumenê ji bicî dibe.	-	-

Made	Nivîseke şûngir	Sedemên nivîsê
Made 7- a- Rêpêderê zanyariyan xwedî van erk û desthilatan e: 1- Wergirtina giliyan ji pêşkêşkerên xwestekên bidestxistina zanyariyan û pêşkêşkirina wan giliyan bo Encumenê ji bo serrastkirinê. 2- Encamdana tedabîrên rêvebirî û pîşeyî yên pêwîst ji bo bicîkirina erk û desthilatên li ser milî wî, dinav de jî sazkirina malpereke elektironî li ser tora internêta ku yasadanên peywendîdar û forma xwesteka zanyariyan û tedabîrên pêşkêşkirina zanyariyan tê de belavkirî bin. b- Rêpêderê zanyariyan weke aliyê kontrolkar e (Yek ji polisên dadweriyê ye), û ji mafê wî ye ku derbasî her rêveberiyê li jêr desthilata yasayî be, bibe û vekolîne li gel her karmendekê bi tenê bi armanca gehiştin bo zanyariyên pêwîst, bike, û veguhestina kesên berpirs dîberveşartin yan têkbirina zanyariyan yan guhertina wan bi şewazekî berovajî rastiya bi mebesta revîn ji pêşkêşkirina wan, bo dadgehê.	-	-
Made 8- Divê berpirs rê li ber bidestxistina zanyariyan û gerentiya eşkerekirina wan bê sistbûn û bi awayê ku di vê yasayê de hatiye, xweş bike. Divê rêveberiya li jêr hukmên vê yasayê, bi şewazekî otomatîkî bê pêwîstiya xwestekan, van zanyariyên sereke pêşkêş bike: a- Pêkhate, erk, û zanyariyên girêdayî budceya wê û xizmetguzariyên ku pêşkêşî hemwelatîyan dike. b- Biryar û rênima û giştandin û bîrname yên ku yasa û sisteman şirove dikin yan rêxistinî bin. c- Mîkanîzim û tedabîrên wê yên bedrest ji bo wergirtina xwestekên hemwelatîyan û giliyên wan derbarê karê wê, serbarî kurteyekê li ser koma xwestek û giliyên ku salane têne pêşkêşkirin û derencamên wan. d- Tedabîrên pêwîst ji bo pêşkêşkirina xwestekeke bidestxistina zanyariyan û sistem û rêsa û yasa bicîkirina rêveberiyê ji erkên xwe re. h- Naveroka biryar û yasayên giştî di rêveberiyê ku dibe ku bandorê li ser hemwelatîyan bikin. u- Mîkanîzim û tedabîrên ku rê didin hemwelatîyan bejdariyê di amadekirina yasayên rêveberiyê de, bibin.	-	Nivîsa (c) rê dide lezbûna bidestxistina zanyariyan dema hebûna metirsiyekê li ser jiyana kesekî (Bi taybet di rewşên girtina ne-eşkere yan windakirina bi neçarî de) habeas corpus

Made	Nivîseke şûngir	Sedemên nivîsê
Made 9- a- Xwesteka bidestxistina zanyariyan bi nivîskî yan elektironî li gorî forma taybet bi vê mebestê tê pêşkêşkirin, tê de navê pêşkêşkarê xwestekê û navnîşana wî ji bo agahdarkirinê tê nivîsandin. d- Divê kesê berpirs herî zêde di heyama 15 rojên kar de ji roja din ya mêjoya pêşkêşkirina xwestekê de, bersiva xwestekê yan redkirina wê bide, bi mercê ku beriya wê yekê zanyariyên ku ew dixwaze, eşkere nekiribe. Eger ew xwestek girêdayî jiyana kesekî yan azadiya wî be, divê ew dem ji bo 48 demjimêran herî zêde, were kêmkirin. c- Piştî wergirtina xwestekê yekser divê karmendê taybet belgeyeke nivîskî yan elektironî ku tê de hejmar û mêjoya xwestekê û corê zanyariya daxwazkirî hebe, bide pêşkêşkarê xwestekê. d- Divê kesê berpirs di heyama 15 rojên kar de ji roja din ya mêjoya pêşkêşkirina xwestekê de, bersiva xwestekê yan redkirina wê bide, bi mercê ku beriya wê yekê zanyariyên ku ew dixwaze eşkere nekibe. Eger ew xwestek girêdayî jiyana kesekî yan azadiya wî be, divê ew dem ji bo 48 demjimêran herî zêde, were kêmkirin. h- Eger beşek ji zanyariyên daxwazkirî li gorî lîsta dabeşkirî be, û beşê din ne dabeşkirî be, bersiva xwestekê li gorî sînorê erêkirî û li gorî hukmên vê yasayê tê dan. u- Eger zanyarî dabeşkirî be, divê dabeşkirina wê beriya mêjoya xwesteka bidestxistina wê be. z- Nabe berpirs eşkerekirina zanyarîne ku berê ji bo xelkê bedrest bûn, red bike. v- Eger zanyariyên daxwazkirî li wê rêveberiyê tune bin, xwestek ji bo rêveberiya peywendîdar tê veguhestin. t- Eger zanyariyên daxwazkirî bi sedema borîna dema destnîşankirî hatibin têkbirin, divê berpirs wê yekê ji bo pêşkêşkarê xwestekê bi nivîskî zela bike. i- Retkirina xwestekê divê behanekirî û bi sedem be, retkirina bersivdanê li ser xwestekê di dema destnîşankirî de, weke biryareke retkirinê tê dîtin.	-	Nivîsa (c) rê dide lezbûna bidestxistina zanyariyan dema hebûna metirsiyekê li ser jiyana kesekî (Bi taybet di rewşên girtina ne-eşkere yan windakirina bi neçarî de) habeas corpus

Made	Nivîseke şûngir	Sedemên nivîsê
Made 10- a- Têçûyên derbarê çapkirin û kopîkirina zanyariyên daxwazkirî bi alavên teknîkî li ser pêşkêşkarê xwestekê ne, eger ew zanyarî bi şêwazekî ku nayên çapkirin yan kopîkirin hatibin qeydkirin, divê pêşkêşkarê xwestekê bi wê yekê were agahdarkirin. b- Bihayê her tiştê ku rêveberî beramberî çapkirin yan kopîkirina zanyariyan bistîne, bi biryareke Encumena Wezîran li gorî pêşbîniya Encumenê, tê destnîşankirin. c- Têçû ti dema borandî ji aliyê karmendan ve ji bo amadekirina van kopiyan yan pêşkêşkirina wan yan veguhestina wan, li xwe nagire.	-	-
Made 11 - bi berçavbirina hukmên yasadananên cîbicîkar, divê berpirs zanyariyên girêdayî van babetan eşkere neke: - a- Zanyariyên ku dibe ku eşkerekirina wan zîyanê bighîne ewlekariya niştîmanî, û bi taybetî belgeyên weke parastina nihênîyên berevanî û ewlekariyê hatine dabeşkirin. b- Zanyariyên girêdayî aliyekî sêyem bê erêkirina wî eger mafê taybetmendiya wî yan nasnameya kesên ku zanyarî bi armanca raportkirinê derbarê bînpêkirin yan rewşîne gendeliyê, pêşkêş kiribin, bînpê bike. c- Zanyariyên ku dibe ku eşkerekirina wan, zîyaneke dijwar li van babetan bike: 1- Rêgirtin li ber tawanekê yan eşkerekirina wê. 2- Girtin yan dadgehkirina tawanbarinan. 3- Rêvebirina dadweriya baş. d- Dema herî zêde ya belgeyên dabeşkirî sî sal in ji roja dabeşkirina wan, û piştî borîna vê demê, divê werin eşkerekirin.	-	-

Made	Nivîseke şûngir	Sedemên nivîsê
Made 12 - Divê her rêveberiyek zanyarî û belgeyên xwe yên bedrest li gorî binemayên pîşeyî û hunerî û guncaw li gel hukmên vê yasayê, rêzbend û birêk bixe.	-	-
Made 13- Berpirs dikare her desthilateke xwe ku di nivîsa vê yasayê de hatiye, bide her karmendekî bilind yê rêveberiyê, û divê ew rêpêdan nivîskî û destnîşankirî be.	-	-
Made 14 a- Pêşkêşkarê xwestekê dikare giliyekê li dijî berpirsî ji bo Encumenê bi rêya rêpêderê zanyariyan di dema retkirina xwesteka wî yan retkirina bersiva xwestekê ji aliyê berpirsî ve derbarê pêşkêşkirina zanyariyên daxwazkirin di heyama (30) rojan ji roja ku bi biryara retkirinê yan dawîhatina dema destnîşankirî li gorî yasayê, hatiye agahdarkirin, pêşkêş bike. b- Divê Encumen di heyama sî rojî ji roja wergirtinê, biryara xwe derbarê giliyê bistîne, eger na, ew gilî weke retkirî tê dîtin û dema tanedana giliya li dijî berpirsî ya li gorî birgeya (a) ji vê madeyê, biserde diçe, dema tanedanê ji roja ku pêşkêşkarê xwestekê derbarê retkirina giliya xwe bi nivîskî hatiye agahdarkirin yan ji mêjoya derbasbûna dema terxankirî ji bo standina biryarê li ser giliyê ji aliyê Encumenê ve, destpê dike. c- Dema biryara Encumenê piştewaniya biryara berpirsî bike, ew biryar dikare rastî tanedanê ji aliyê pêşkêşkarê xwestekê û ji aliyê rêvebir ve were eger aliyê rêvebir bibîne ku biryara Encumenê berovakiyê yasayê ye.	-	-

Made	Nivîseke şûngir	Sedemên nivîsê
Made 15- a- Dadgeha Rêvebirî karê xwendina biryara redkirina xwesteka bidestxistina zanyariyan dike, bi mercê ku pêşkêşkerê xwestekê giliyekê li dijî berpirs di maweya (30) rojî ji roja piştî roja bidawîhatina dema destnîşankirî li gorî vê yasayê ji bo bersivdanê yan redkirinê yan nedana bersivê, pêşkêş bike, yan jî bi biryarekê ji Encumena Zanyariyan be. b- Kirêya tanedan bi biryarê di asta herî kêr de be. c- Ji mafê dadgehê ye ku pişkinîna belgeyên dabeşkirî bike û guncawbûna wê li gel mercên tedabîrî û yên babetî yên taybet bi dabeşkirina zanyariyan, piştrast bike.	-	-
Made 16-Bê bînpêkirina her sizayeke tundtir ku di her yasayeke cîbicîkar de hatiye, ev alî tene sizadan: a- Hin zanyarî veşartin yan bi şêwazekî berovajiyê rastiye guhertin yan tîk birin yan rê li ber gehîştina wê girt yan pêşkêşkirina zanyariyan bê behaneyeke yasayî red kir, herî zêde rastî şeş mehan zindan yan sizayeke darayî herî kêr pîncî hezar Lêreyên Sûriyê û herî zêde sed hezar Lêreyên Sûriyê, tê. b- Bînpêkirina her hukmekî vê yasayê ku sîza li ser nehatiye nivîsandin, pêkînerê wê rastî sizayekê herî kêr sed hezar Lêreyên Sûriyê û herî zêde Meliyonek Lêreyên Sûriyê, dike.	-	-
Made 17 - Encumena Wezîran sistemên pêwîst ji bo bicîkirina hukmên vê yasayê derdixe, dinav de jî sistemeke ku belgeyên parastî yên dikarin werin eşkerekirin û herî kêr sî sal li ser qeydkirina wan re derbas bûne, destnîşan dike.	-	-

Made	Nivîseke şûngir	Sedemên nivîsê
Made 18- Her hukmek di her nivîseke din ya yasadana dê de hebe ku berovajiyê hukmên vê yasayê ye, tê jinavbirin.	-	-
Made 20 -Rênimayên cîbicîkar yên vê yasayê li gorî pêşinyara Wezîrê Geşepêdana Rêveberî bi hemahengî li gel Encumena Bilind ya Ragihandinê, bi biryarekê ji Encumena Wezîran tî derxistin.	-	-
21-Ev yasa di rojnameya fermî de tê belavkirin û piştî sê mehan ji belavkirinê, dikeve di warê bicîkirinê de	21-Ev yasa di rojnameya fermî de tê belavkirin û piştî sê mehan ji belavkirinê, dikeve di warê bicîkirinê de	Heta ku dewlet karmendan li ser bicîkirina yasayê û hişyariyê derbarê hebûna wê, rahênan bike, bicîkirin 3 heta 6 mehan tê paşxistin



Lîsta çavkanî û jêderan

1	El-berxûsî, Bilal (2004). Mafê Pêzanîn yan Azadiya Gehiştin bo Zanyariyan, Ram Ellah, Filestîn
2	Mendel, Tobî (2003) Azadiya Zanyariyan, lêkolîneke yasayî ya berawirdkirinê, YÛNISKÖ.
3	Kirox, Pîter û Prays, Monro (2005). Jîngeha Guncaw ji bo Alavên Ragihandinê, di "Mafê raportkirinê de"-Rola alavên Ragihandina Cemawerî di Geşepêdana Aborî de, Peymangeha Banka Navdewletî, Lêkolînine Geşepêdanê El-Ehliye ji bo Belavkirin û Dabeşkirinê, `Uman-Urdun.
4	ARTICLE 19, (1999). The Public's Right to Know: Principles on Freedom of Information Legislation. London.
5	Welsh, T. Greenwood, W. (2001). Essential Law for Journalists. Butterworths, 6th ed. UK.
6	Daruwala, M. & Nayak, V. (2009). Our Rights Our Information. Empowering people to demand rights through knowledge, Commonwealth Human Rights Initiative.
7	Mendel, T. (2004), Freedom of Information, a Comparative Legal Study. UNESCO.
8	Novel, A. S. (2006). Press Freedom and Poverty. An analysis of the correlations between the freedom of the press and various aspects of human security, poverty and governance, UNESCO-CPHS Research Project released in July 2006 by UNESCO and the Center for Peace and Human Security, Sciences Po, Paris.

